بخش (سیلاب kî) در یک واژه در واقع کوچکترین قسمت در کلمه است که با حروف صدادار در کلمه درست می شود. مثلاً karger یک کلمه دو سیلابی (دو صدایی) است، یعنی ger + kar که در اینجا kar بخش (سیلاب یا صدای) اول می باشد و ger بخش (سیلاب یا صدای) دوم می باشد. هر یک از این سیلاب ها کوچکترین قسمت واژه karger است که از آن کوچکتر تقسیم پذیر نیستند. ما نمی توانیم بخش kar را به تقسیمات k + a + r تقسیم و بخش کنیم، چونکه کوچکترین بخش یا سیلاب بایستی دارای یک حرف صدادار باشد، و همینطور برای ger نیز صادق است. بنابراین کلمه karger یک واژه دو سیلابی (du kîte) در گُرمَنجی است.

کلمه ba (با) یک واژه یک سیلابی (yêk kîte) است، چونکه نمی تواند به بخشهای کوچکتر از این تقسیم شود. بطور کلی در یک واژه هر چند حرف صدادار باشد به همان تعداد نیز صدا (سیلاب یا بخش) وجود دارد و بر اساس این اصل و پایه واژه های گُرمَنجی بسته به تعداد حروف صدادار موجود در آنان به واژه های (کلمات) یک سیلابی، دو سیلابی، سه سیلابی، چهار سیلابی و پنج سیلابی تقسیم می شوند.

الف - **واژه های یک سیلابی:** در این واژه ها یک حرف صدادار موجود است. مثال:

Bav, dê, av, bar, xak, ap, dar, sar, ji, bi, li, yêk, bir, mir, kir, çû, bû, deng, bang,  
...

ب - **واژه های دو سیلابی:** در این کلمات دو حرف صدادار وجود دارد و با دو صدا از هم جدا (بخش) می شوند. مثال:

Baran (bar + an), hêvî (hê + vî), karwan (kar + wan), hacir (ha + cer), ...

پ - **واژه های سه سیلابی:** در این کلمات سه حرف صدادار وجود دارد و با سه صدا از هم جدا (بخش) می شوند. مثال:

Hilkişîn (hil + ki + şîn), şorişger (şo + riş + ger), raketin (ra + ket + in), ...

ت - **واژه های چهار سیلابی:** در این کلمات چهار حرف صدادار وجود دارد و با چهار صدا از هم جدا (بخش) می شوند. مثال:

Şehristanî (şeh + ris + ta + nî), koçbarkirin (koç + bar + kir + in)

Welatparêz (we + lat + pa + rêz), ...

و به همین صورت واژه های پنج سیلابی نیز بخش می شوند.

## درس سوم

حروف اضافه در کُرمَانجی

Daçek li Kurmancî

## حروف اضافه Daçek

حروف اضافه به تنهایی معنی خاصی ندارند، اما وقتی که به همراه کلمات بکار روند معنی دار می شوند و همچنین معنی و مفهوم کلمات را نیز در جمله زلال و شفاف می نمایند.

به مثالهای زیر توجه کنید :

Qoçan

**Di** Qoçanê **da**

**Li** Qoçanê

**Ji** Qoçanê

**Bi** Qoçanê **re**

**Bi** Qoçanê **va**

Mala min **di** Qoçanê **da** ye.

خانه من در قوچان است.

Ez **bi** Qoçanê **ra** çûm.

من از طریق قوچان رفتم.

Ez **li** Qoçanê rûdinim.

من در قوچان سکونت دارم.

Ez **bi** xelkê Qoçanê **va** me.

من با مردم قوچان هستم.

Ez **ji** Qoçanê têm.

من از قوچان می آیم.

حروف اضافه رایج که در زبان کردی عموماً استفاده می شوند را در اینجا مرور می کنیم.

حروف اضافه پایه ای در زبان کردی: **bi, di, ji, li, bê, ji** می باشند، بقیه معمولاً با کمک اینها درست می شوند. حروف اضافه یا معمولاً به تنهایی بکار می روند (**bê**) . یا هم به تنهایی و هم به همراه یک پسوند (**de, re, ve**) بکار می روند (**bi, ji, li**) . و یا تقریباً همیشه به همراه یک پسوند (**de, re, ve**) بکار می روند (**di**) . و یا به همراه یک اسم که در واقع یک حرف اضافه مرکب را درست می کنند .

**bi** ..... **ra**

**di** ..... **da**

**ji** ..... **ra**

**bi** ..... **va**

**li** ..... **ra**



پسوندهای **de, re, ve** در حالت نوشتاری و زبان محاوره ای معمولاً بصورت **da, ra, va** بیان و تلفظ می شوند (بستگی به مناطق کردنشین، البته هر دو حالت درست است). در حالت نوشتاری و از نظر املائی، حروف اضافه که همراه با یک اسم می آیند از آن اسم جدا نوشته می شوند. اسامی که بعد از یک حرف اضافه می آیند هماهنگ و همواخت با آن حرف اضافه کمی تغییر یا تصریف می شوند، در واقع این اسامی با این تغییر و انعطاف، خود را سلیس، همبسته و همواخت با آن حرف اضافه می کنند که در زبان کردی اصطلاحاً **Tewandin** می گویند، که زبان محاوره ای کردی را واقعاً خوش بیان و خوش آهنگ، نرم و روان، بسیار شیرین و زیبا می کند. مثال:

(**ji Şîrwanê, li debistanê, bi Rojînê, ...**)

در اینجا **ê** به اسم اضافه شده و آن را انعطاف داده یا **tewandin** کرده است. (آن را چلونده، کج و همواخت کرده) در درسهای آینده مبحث **Tewandin** را به تفصیل توضیح خواهیم داد، که حقیقتاً یکی از مباحث بسیار دلپذیر دستور زبان ما است.

**bê** بدون

Masî **bê** avê nikarin bijîn.

ماهی ها بدون آب نمی توانند زندگی کنند.

**bêdirav** بی پول

Ez **bê** te narim.

من بدون شما نمی روم.

**bêdeng** (بی صدا) ساکت

Ew **bê** sebeb hat kuştin.

او بدون دلیل کشته شد.

Wan **bê** tirs şer dikirin.

آنها بدون ترس می جنگیدند.

**Bê** min mere.

بدون من نرو.

**Bê** lez û tirs hat mala me.

بدون عجله و ترس به منزل ما آمد.

**Bê** tişt nabe.

بدون چیز نمی شود.

**Bê** wan tu kes nehat.

بدون آنها هیچ کس نیامد.

Hevala min **bê** min çû daristanê.

دوست من بدون من به دارستان (باغ درخت زار) رفت.

Ez **bê** qelem nikarim binivîsim.

من بدون قلم نمی توانم بنویسم.

Xizanê (zarokê) **bê** dê navika xwe bi xwe jêdike.

بچه های یتیم (بی مادر) خودشان بند ناف خود را می برند (کنایه از استقلال است).

Aşê dînan **bê** av digere.

آسیاب دیوانه ها بدون آب می چرخد (کنایه از سبکی مغزی).

Çima tu îro **bê** kêf î ? na, ez bi kêfim.

چرا امروز شما خوشحال نیستی؟ نه، من خوشحالم.

Va (ev) xanîya yê Daniyal e û **bê** wî kes tê de rûnane.

این خانه مال دانیال است و بدون ایشان کسی در آن ساکن نمی شود.

**Bê** debistanê em bi zehmet zimanê xwe pêş ve bêxin.

بدون مدرسه پیشرفت زبان ما مشکل است (زحمت دارد).

**Bê** gotina min kir û çû.

بدون توجه به گفته هایم انجام داد و رفت.

**Bêyî** (**bêî**) ku wan bigota, min zanîbû.

بدون اینکه آنها بگویند، من می دانستم.

**Bêî** tu dişwariyê qebûl bû.

بدون هیچ دشواریی قبول شد.

**Bêî** ku temrîn bike tesdîqa otomobîlê hilgirt.

بدون اینکه تمرین رانندگی کند تصدیق اتومبیل را گرفت.

**Bêî** ku te bigota min zanibû.

بدون اینکه تو بگویی من می دانستم.

**Bêyî** ku em bange wan biken, ew hatin.

بدون آنکه ما آنها را صدا کنیم، آنها آمدند.

## با bi

**Bideng** صدادر

**Bidirav** (dara, dewlemend) پولدار

Masî **bi** avê dijîne.  
ماهی با آب زندگی می کنند.

Ez **bi** otobosê (otomobîlê) çûm Qoçanê.  
من با اتوبوس (ماشین سواری) به قوچان رفتم.

Dinya **bi** dor e, ne **bi** zor e.  
دنیا با صبر دور می زند، نه با زور.

Aş **bi** nobet e, ne **bi** kotek e.  
آسیاب با نوبت است، نه با ضربت.

Wan **bi** tirs li me difikirîn / temaşe dikirin.  
آنها با ترس به ما تماشا میکردند (فکر میکردند).

Rojîn **bi** trêne (qetarê) çû mala xalê xwe.  
روژین با قطار (ترن) به منزل دایی خود رفت.

Daniyal **bi** qelemê dinivîse.  
دانیال با قلم می نویسد.

Ma çaya te **bi** şîr e? Na, çaya min bê şîr e, lê **bi** şeker e.  
آیا چای شما شیر دارد؟ نه، چای من بدون شیر است، اما شکر دارد.

Daniyal **bi** duçerxê diçe debistanê.  
دانیال با دوچرخه به مدرسه می رود.

Rojîn **bi** topê dilîze.  
روژین با توپ بازی می کند.

Daniyal **bi** kevçî û çengalê nîn dixwe.  
دانیال با قاشق و چنگال غذا می خورد.

Evîn **bi** firokê diçe mala apê xwe.  
ئوین با هوایما به منزل عموی خود می رود.

Ew **bi** navê min deng dike (gep dike).  
ایشان با اسم من صحبت می کند.

Çûçik **bi** hewa ketin.  
گنجشکها به آسمان افتادند.

Hûn **bi** vî awayî dihêvîsin.  
شما با این شیوه یاد می گیرید.

Ez **bi** kêrê (kardê) goşt jêdikim (dibirim).  
من با چاقو گوشت می کنم (می برم)

Zebeş (qerpûz) **bi** dendik e.  
هندوانه با دانه (هسته) است.

**Bi** vî awayî nabe.  
با این طرز (شیوه) نمی شود

Xanîyê xwe **bi** destên xwe avakir.  
Kela me **bi** destê bavkalê min hatiye avakirin.

**Bi** çend ?

Yêk heye **bi** sedî hêja ye, sed heye ne **bi** yekî.

**Bi** tenê nabe.

**Bi** xwe têm.

Kambîz **bi** xwe hat.

Hûn xwe **bi** xwe diwestînin.

**Bi** gotinê hec qebûl nabe.

**Bi** navê xudayê mihrivan.

Dirav **bi** bêrika xwe xist.

Firoke **bi** hewa ket.

Ew hêç **bi** kurmanjî nizane.

Ew **bi** Kurmancî rind gep dike.

با – باهمدیگر **bi .... ra ( re)**

**bi** hev **ra** با همدیگر

Daniyal **bi** Rojînê **ra** ye.

دانیال با روژین است.

**Bi** wî **ra** bibêje **ku** otobos çûye.

به ایشان (مرد) بگوئید که اتوبوس رفته است.

Ew **bi** Delalê **ra** gep nake.

ایشان با خانم دلال صحبت نمی کند

Rojîn **bi** Daniyal **ra** dilîze.

روژین با دانیال بازی می کند.

Bavo **bi** Rojînê **ra** çû debistanê.

پدر با روژین به مدرسه رفت.

Ez **bi** Rojînê **ra** çûm mala wan.

من با روژین به منزل آنان رفتم.

Rojîn du bendan **bi** hev **ra** girê dide.

روژین دو تا بند را به هم گره می زند

Ew **bi** hevalê xwe **ra** gep dike (deng dike.)

ایشان با دوست خود صحبت می کند.

Daniyal **bi** min **ra** hat.

Em **pev ra** (**bi** hev **ra**) çûn.

Rojîn **bi** pêlekanê **ra** hilkişiya.

**Bi** carekê **ra** nabe.

**Bi** a min bike û **bi** wî **ra** here.

Ew **pev ra** (**bi** hev **ra**) gep diken.

Ew gîya **pê ra** (**bi** vê xwarinê **ra**) teva nabû.

Îro topa min **bi** min **re** nine.

امروز توپ من با من نیست.

Ez **bi** dîya (dêya) xwe **ra** çûm kelê.

من با مادرم به روستا (قلعه) رفتم.

Tu **bi** min **ra** hatî mal.

تو با من به منزل آمدی.

**Pê** (**bi** wê / wî) **ra** nebêje.

به ایشان (زن / مرد) نگوئید.

Ew **pê** (**bi** wê / wî) **ra** dilîze.

او با ایشان (زن / مرد) بازی می کند.

**bi ..... va ( ve)**

Gulperî jî **bi** me **va** tê debistanê.

خانم گلپری هم با ما به مدرسه می آید.

Daniyal **bi** wir **va** hilkişiya.

دانیال از آنجا بالا رفت (صعود کرد).

Cecoxanê **ka**wî **bi** sed siwareyî **va** bi rê ket.

ججوخان کوانلویی با یکصد سواره نظام به راه افتاد.

Rojîn **bi** Daniyal **va** ye.

روژین با دانیال است.

Apî min, **bi** hezar pezên xwe **va**, bawer dike Keyxosrow e.

Faroj **bi** Qoçanê **va** girêdayi nine.

**Bi** ser û berê xwe **va** zivistan bi ser xist.

**Bi** darê zorê kar pêş **va** nare.

Eks (wêne) **bi** dîwêr **va** daliqandî ye (dardakiriye).

Ez **bi** hevala xwe **va** girêdayî me.

Ez **bi** xaka welatê xwe **va** girêdayî me.

Kerê xwe **pê va (bi vê darê va)** girê bide.

**bi ..... da ( de)**

Xanî **bi** ser **da** ket.

خانه به رویش افتاد.

Destmala min **bi** avê **da** çû.

دستمال من با آب رفت.

Av **bi** ser wir **da** diherike.

آب به روی آنجا جاری است (حرکت می کند).

Min tu kes **bi** rê **da** nedît.

من هیچکس را در راه ندیدم.

Daniyal gayê xwe **bi** gadariyê **da** kuşt.

دانیال گاو خود را در گاوداری کشت.

Ez **bi** nêçîra bizinkovî **da** ji zinarê firîm.

من در هنگام شکار بز کوهی از صخره پرت شدم.

**bi ser ..... da**

Wê av **bi ser** wî **da** rijand.  
Av **bi ser** vir **da** diherike.

Dizan **bi ser** me **va** girtin.  
Vê kitabê dayne **ser** mîzê.

**di** در

Vî kevçî **di** şorbê meke, qilêr e.  
این قاشق را در سوپ نکن، کثیف است.

Ez **di** xwe fikirîm.  
من در خود نگریستم.

Derman **di** xwe da.  
دارو به خودش مالید.

**di ..... da ( de)** در - در داخل

Kevçî **di** kêşoya mîzê **da** ne.  
قاشقها در کشوی میز هستند.

Gul **di** guldanê **da** ye.  
گل در داخل گلدان است.

Masî **di** avê **da** dijîn.  
ماهی در داخل آب زندگی می کنند.

**Di** piyalê **da** av heye.  
در لیوان آب هست.

Mêwe **di** yêxçalê **da** ne.  
میوه ها در داخل یخچال هستند.

**Di** kasê **da** çay tune.  
در کاسه چای وجود ندارد.

Xwê **di** xwêdankê **da** ye.  
نمک در داخل نمکدان است.

**Di** nav daran **da** gul hebûn.  
در میان درختان، گلها وجود داشتند.

Kitab **di** kîf **da** ne.  
کتابها در داخل کیف هستند.

**Di** hêlînê **da** du hêk hene.  
در داخل لانه دو تخم وجود دارند.

**Di** avê **da** masî hene.  
در داخل آب ماهی وجود دارند.

Çûçik **di** hêlînê **da** dijîne.  
گنجشکها در داخل لانه زندگی می کنند.

Kinc (cil, libas) **di** komidê (cildanê) **da** ye.  
کت (رخت، لباس) در داخل کمد است.

Kitab **di** çaviya (kêşoya) mîzê **da** ye.  
کتاب در کشوی میز است.

Qelem **di** cêba (bêrîka) Daniyal **da** ye.  
قلم در جیب دانیال است.

Daniyal **di nav** baxçeyê (baxçê) me **da** ye.  
دانیال در داخل باغچه ما است.

Min **di** vê derya **da** avjenî hêvîsî.  
من در این دریا شناکردن (غواصی) را یاد گرفتم.

Wî jî **di** vê derya **da** melewanî hêvîsîbû.  
ایشان (مرد) هم در این دریا ملوانی (قایقرانی) را یاد گرفته بود.

Kesên wekî wî **di** cihê xwe **da** nasekinin.  
کسانی مثل ایشان (مرد) در جای خود نمی ایستند.

Min **di** jîyana xwe **da** qet tiştekî haka (weha) nedîtîbû.  
من در زندگی خود هیچوقت چنین چیزی ندیده بودم.

Min **di** sala 1975,an **da** dest bi debistana destpêkê kir.  
من در سال ۱۹۷۵ مدرسه ابتدایی را شروع کردم.

Min **di** sala 1980,an **da** dest bi debistana navîn kir.  
من در سال ۱۹۸۰ مدرسه راهنمایی (مدرسه میانی) را شروع کردم.

Rojîn **di** kitaba xwe **da** behsa ciwaniya xwe dike.  
روژین در کتاب خود بحث زمان جوانی خود را می کند.

Xelk her sal **di** destpêka biharê **da** cejna (ceşna) Newrozê **bi** dihol û zirne û kolaman pîroz dikan.  
مردم هر سال در ابتداء بهار جشن نوروز را با دوهول و سورنا و آواز مبارک می کنند.

Du mirîşk **di** pûndikê **da** hêk dikan.  
دو مرغ در داخل مرغدانی تخمگذاری می کنند.



Zanîna min **di** vî warî **da** rind nine.  
 Ez dizanim **di** bêrika te **da** çî heye.  
**Di** şehîrî me **da** meydanê gir (mezin) heye.  
**Di** van rojan **da** em pir kêfxweş in.  
 Daniyal **di** tengasîyê **da** maye.  
**Di** wê wextê **da** ez li wir nebûm.  
 Min hîn **di** xweşikîya te **da** tu kes nedîtiye.  
 Cecoxanê Kawî selat (serbazên Urisan) **di** cih **da** girtin.  
 Tu **di** vê babetê **da** pir zêde gep dikî.  
 Ew **tê da** (**di** vî xanî **da**) ye.

### di ..... ra ( re)

Ev karê xwe <b>di</b> bin <b>ra</b> dike. ایشان کار خود را زیرکی انجام می دهد.	<b>Di</b> ser me <b>ra</b> ewr hene. در بالای سر ما ابرها هستند.
Daniyal kevçî <b>di</b> binî şîvê <b>ra</b> kir. دانیال قاشق را به زیر شام کرد.	Tîkan <b>tê</b> ( <b>di</b> wê / wî) <b>ra</b> çûye. خار به ایشان (زن / مرد) فرو رفته است.
Derzî <b>tê</b> ( <b>di</b> wê / wî) <b>ra</b> kir. سوزن به او (زن / مرد) فرو کرد.	Sîyare qamçî <b>tê</b> ( <b>di</b> hêsp) <b>ra</b> kişand. اسب سوار شلاق به آن (در اسب) کشید.
Em <b>di</b> newalekê <b>ra</b> derketin ser merzê. ما از طریق یک دره به روی تپه رسیدیم.	
Ew <b>di</b> vir <b>ra</b> çû. Rêya wê gadarîyê <b>di</b> ser pirê <b>ra</b> dice. Ew <b>di</b> vir <b>ra</b> çû mal. Çima tu <b>di ber</b> pencîra me <b>ra</b> diçûyî. Ew kî bû, <b>di</b> ber te <b>ra</b> red bû. Derzî <b>tê ra</b> ( <b>di</b> destê min <b>ra</b> ) çû.	

### di ..... va ( ve)

Ez <b>di</b> deştê <b>va</b> hatim vira. من از دشت به اینجا آمدم.	Min mîx <b>di</b> dîwêr <b>va</b> kuta. من میخ را به دیوار کوبیدم.
--	---

**di bin ..... da ( de )** در زیر (برای چیزی)

Sol (pêlav, qondere) **di bin** mîzê **da** ne.  
کفشها در زیر میز هستند.

Solên Gulperîyê **di bin** pêlekanê **da** ne.  
کفشهای خانم گلپری در زیر راه پله هستند.

Neft **di bin** herdê **da** ye.  
نفت در زیر زمین است.

Hespê min **di bin** min **da** hate kuştin.  
Kursî (şendelî) **di bin** mîzê **da** ye.  
Sed siware (sîyare) **di bin** destê Cecoxanê Kawî **da** bûn.

**di bin ..... ra ( re )** در زیر - پایین (برای فعلیتی، حرکتی)

Malên Gulperîyê wan **di bin** malên me **ra** danîn.  
آردو (کاروان کوچرو) گلپری اینها در پایین منزلگاه (خیمه سرا) ما اتراق کردند.

**Di bin** çavan **ra** li min difikirî (temaşê dikir).

Ew **di ber** hev didin.  
**Di ber** mala me **ra** diçûn.  
**Di ber** mala me **da** darek heye.  
**Di ber** hev **da** çûn.  
**Di ber** vê zehmetê hêja **va**, ez ê wî xelatkim.

**di hundirê ..... da ( de )** در داخل

Sêv **di hundirê** yêxçalê **da** ne.  
سیبها در داخل یخچال هستند.

Av **di hundirê** kûz **da** ye.  
آب در داخل کوزه است.

Neft û gaz **di hundirê** herdê **da** ne.  
نفت و گاز در داخل زمین هستند.

**di ser ..... ra**

Xaniyê wan **di ser** hev **ra** ne.  
 Wê gul **di ser** dîwêr **ra** avêt.  
 Daran **di ser** xwe **ra** me bire.

**di kuda ( di kude )** در کجا

Kitaba te **di kuda** ye?  
 کتاب تو در کجا است؟

Kitaba min **di kîf da** ye.  
 کتاب من در داخل کیف است.

Kincên we **di kuda** ne?  
 لباسهای شما در کجا هستند؟

Kincên me **di komidê da** ne.  
 لباسهای ما در داخل کمد هستند.

**di navbeyna ..... da ( de )** در میان

Sêv **di navbeyna** pîvaz û pirtiqalê **da** ye.  
 سیب در میان پیاز و پرتقال است.

Mamoste **di navbeyna** şagirdan **da** ye.  
 معلم در میان دانش آموزان (شاگردها) است.

**Di navbeyna** me û we **da** dan û standin hebû.

**Di navbera** herd û asmîn **da** ewr hene.

Em **di nav** hev **da** rûniştibûn.

**Di nav** kelê **da** tu kes nemaye.

Rojîna min **di nav** wan **da** ye.

**Di nav** xelkê **ra** red bû.

همانطور که در بالا بیان شد گاهی یک حرف اضافه به همراه یک اسم آمده که در واقع یک حرف اضافه مرکب را درست می‌کنند، مثال:

**Bêpar, bêcan, bêkes, bêav, bêbav, bêdê, bêhûş, bêbext, bêzar, bêçî, bêçîk,**  
**bêgoman, biţam, bihûş, bijan, bijartin, biav, berdestî, bermalî, berçavk,**  
**berbang, binçeng, bindest, bingeh, binav, dergêh, dergûş, navber, navçe,**  
**navçeng, paşeroj, paşverû, paşpê, pêşverû, pêşîn, jibo, ... hwd**

**ji** از، درست شدن از

( حرف اضافه **ji** معمولاً در جلوی اسم یک مکان قرار می‌گیرد و بیرون رفتن از آن مکان را نشان می‌دهد، البته معنی‌های دیگر هم دارد، به مثالهای زیر توجه کنید)

Ez **ji** debistanê têm.

من از مدرسه می‌آیم.

Ez **ji** mala xalê xwe têm.

من از منزل دایی خود می‌آیم.

Ew **ji** mal çû.

او از خانه رفت.

Kambîz **ji** dawetê tê.

کامبیز از عروسی می‌آید.

Ez **ji** mal têm.

من از منزل می‌آیم.

Rojîn **ji** sêvan hez dike.

روژین از سیب لذت می‌برد.

**Ji** darê dakeve.

از درخت پایین شو!

Rojîn **ji** dawetê hez dike.

روژین از عروسی لذت می‌برد.

Rojîn **ji** debistanê tê.

روژین از مدرسه می‌آید.

Min Kurmanjî **ji** dayika xwe hêvîsî.

من کُرمَنجی را از مادر خود یاد گرفتم.

Daniyal **ji** Şîrwanê ye.

دانیال از شهر شیروان است.

Ez **ji** kurm û kêz hez nakim.

من از کرم و حشره خوشم نمی‌آید.

Bavê min **ji** mal derket.

پدر من از منزل خارج شد.

Daniyal **ji** guran natirse.

دانیال از گرگها نمی‌ترسد.

Diya (dayika, dêya) min **ji** dûkanê tê.

مادر من از مغازه می‌آید.

Daniyal berî serşûştinê kincên xwe **ji** xwe dike.

دانیال قبل از اینکه سر خود را بشوید لباس خود را از تن خود میکند.

Ez **ji** Kurmanjên bakûra xorasanê me.

من از کُرمَنجیهای شمال خراسان هستم.

Daniyal **ji** Rojînê kêmek dirav deyn (qerz) kir.

دانیال کمی پول از روژین قرض گرفت.

Ew **ji** bo xelkî xwe kar (xebat) dike.  
او برای مردم خود کار می کند.

Bavê te **ji bo** birayê min radyoyek kirî.  
پدر شما برای برادرم یک رادیو خرید.

Ew bîst sal berê **ji** dayika xwe bûye.  
ایشان بیست سال پیش از مادرش متولد شده است.

Gur **ji** roja bi mijdûman hez dike.  
گرگ از روز مه آلود لذت می برد.

Dînik **ji** dînikan û şîx **ji** meytan hez diken.  
دیوانه از دیوانه ها و شیخ (ملا) از مرده ها خوشحال می شوند (لذت می برند).

Kesê ku **ji** yekê fahm neke, **ji** sedî jî fahm nake.  
کسی که از یک نفر نفهمد، از صد نفر هم نمی فهمد.  
Xanîyê me **ji** yê we bilindtir e.  
خانه ما از مال شما بلندتر است.

Hesp **ji** mehîne (mahîne) bezatir e.  
اسب از مادیان تندتر است.

Golika malê **ji** gayê malê natirse.  
گوسالهء اهل خانه از گاو خانه نمی ترسد.

Hengulîska tilîya (pêçîya) dergistîya min **ji** zêr e.  
انگشتر انگشت نامزد من از طلا است.

Bazinên destê (zendê) destgirtîya min **ji** zîv in.  
انگوهای دست (ساعد) نامزد من از نقره هستند.

Di bezîne (revîne) de ez **ji** te rindtir im.  
در دویدن من از شما بهتر هستم.

Beroş (tasik) a bêrîvanê **ji** mîs e.  
دیگ (پاتیل) کدبانو شیردوش از مس است.

Bêrîvanê şîr **ji** satilê rijande nav tasikê.

کدبانو شیردوش، شیر را از سطل به داخل بادیه (کاسه فلزی) ریخت.

Bizina sor **ji ser** kevirê bêrîyê bazda û beroşa şîr rijand.

بز قرمز از روی سنگ سکوی شیردوشی پرید و دیگ شیر را ریخت.

Çavên hinek **ji** malbata me kesk in, lê yên hinekan jî şîn, reş yan jî qehweyî ne.

چشمهای تعدادی از خانواده ما سبز هستند، اما مال تعدادی نیز آبی، سیاه یا اینکه قهوه ای هستند.

**Ji** mal têm.

Mala min **ji** şehrfî Qoçanê dûr e.

Kulav **ji** liva berxan çêdibe.

Ez **ji** desgirtî ya xwe pir razî me.

Weqes **ji** xwe razî mebe lo.

Jê (**ji** vê derê) tê.

Mast û penîr **ji** şîr çêdibin.

**Ji** wê rojê min dil bi te da.

Ez **ji** te hez dikem.

Kaxez **ji** daran çêdibe.

**Ji** min qehir meke.

Min jê (**ji** yara xwe) hez kir.

Ew **Ji** min hez dike.

Yêk jê (**ji** wan) pir xweşik bû.

Rojînê **ji** qehra wî guldan şikand (işkand.)

Weqes bi rê çûn ku **ji** pê (piyan) ketin.

Koçer **ji** deşta (zozana) gulîlê daketin.

Koçerên êla kawan **ji** çîyayi Ispicîrê barkirin.

Rûyê desgirtî ya min **ji** heyva çardehê rewşentir e.

Yekî **ji** wan got ku li Xorasanê xwendin bi kurmanji lazim e.

Misirxanê kawî **ji** koçberiyê (yêlaq û qîşlaq) dest kişand û di Şîrwanê da cîh girt.

Bi qeyr **ji** (**ji** xeynî) Merawe Tepê, menteqa Serexsê **ji** qîşlaqa koçerên Kurmanj e.

Lepik û şalên stûya serdar û çobazên Yêkitiya Zeferanlu ya êlên Kurdên

Xorasanê **ji** tiftika bizin, yan **ji** herîya pêz û pirçika devan bûn.

**ji ... ra (re)** برای

برای - (بیشتر معنی میل به چیزی داشتن و یا آرمانی را می رساند، معنی های دیگر هم دارد به مثالهای زیر توجه کنید)

**Ji min ra** kêmek dirav bişîne.  
برای من کمی پول بفرست.

Ez **ji** we **ra** tişteki nabêjim.  
من برای شما چیزی نمی گویم.

Rojînê **ji** xwe **ra** bestênî kirî.  
روژین برای خودش بستنی خرید.

**Jê (ji wê / wî) ra** nebêje (mewêje).  
برای ایشان نگویی.

Rojînê **ji** Daniyal **ra** tu tişt negot.  
روژین برای دانیال هیچ چیزی نگفت.

Ez heroj **jê (ji wê / wî) ra** dipirsim.  
من هر روز برای ایشان (زن / مرد) می پرسم.

Daniyal **ji** Rojînê **ra** gulek kirîye.  
دانیال برای روژین یک گل خریده است.

Ew **ji** hevalên xwe **ra** nîn dibin.  
آنها برای دوستان خود غذا می برند.

**ji** xelkê **ra** jîr e, **ji** xwe **ra** kwîr (kûr) e.  
برای مردم زیرک است، برای خودش کور است.

**ji** xelkê **ra** gul e, **ji** xwe **ra** kul e.  
برای مردم گل است، برای خودش ورم (زخم چرکین) است.

Em **ji** Kurdên Xorasanê **ra** xwendin û nivîsîn bi Kurmanjî dixwazin.  
ما برای کردهای خراسان خواندن و نوشتن به کرمانجی می خواهیم.

Ji dêlva ku **ji** bavê min **ra** bibêje, **ji** min **ra** got.  
بجای اینکه به پدر من بگوید، به من گفت.

Yekî **ji** hevalê xwe **ra** got lawikek min heye, hevêl got xwedê **ji** te **ra** bihêle.  
یکی به دوستش گفت که یک فرزند پسر دارم، دوستش گفت خدا برای شما حفظش کند.

Got lê wî dixwaziye bibe şîx, hevêl got xwedê **ji** te **ra** nehêle.  
گفت اما ایشان می خواهد شیخ (ملا) بشود، دوستش گفت خدا برای شما حفظش نکند.

**Ji** te **ra** çî.

Ez **ji** te **ra** her tiştî dibêjim.

Mîn **ji** xwe **ra** digot.

**Ji** mîn **ra** xoşbextî û **ji** reqîbê min **ra** bêbextî mida ken / nida ken.

Kêfa min **jê** (**ji** wê) **ra** tê.

Mîn **jê** (**ji** wê / wî) **ra** da.

Wê **ji** min **ra** sêvek şand.

Wê **ji** min û te **ra** du kitab kirîne.

Va (ev) nana (xwerina) **ji** me û we **ra** hatiye.

Mîn **jê** (**ji** Rojînê) **ra** got.

**Ji** mîn **ra** duçerxêkê bistîne.

**Ji** apî min **ra** kar bikî û nekî yêke.

### ji ... va (ve)

این حرف اضافه معمولاً حرکتی یا عملی را نشان می دهد، معنی های دیگری هم میدهد، به مثالهای زیر توجه کنید.

**Ji** te **va** çî.

به نظر شما چی؟

**Ji** aliyê tendurustî **va** ez xweşim.

از نظر تندرستی من سالم هستم.

**Ji** pê (piyan) **va** ketim.

از پا افتادم.

**ji** pê (pey) te **va** kesek heye.

به دنبال شما (بعد از شما) کسی هست؟

Xanî **ji** binî **va** hilweşiya, ê bi kêrî tişteki nayê.

خانه از بنیان تخریب شد، به کار هیچ چیزی نمی خورد.

Ew **ji** pê me **va** dibezî (direvî).

**Ji** nû **va** dest pê kirin.

**Ji** girê min **va** tişt negihişte min.

**Ji** berê **va** ew dara bûn.

Mîn ew **ji** nêzîk **va** rind dît.

**Ji** wir **va** hat.

**Ji** ber min **va** jî bixwe.

**Ji** dûr **va** temaşe kirin rind nine.

Tu dikarî **ji** ber min **va** gepbikî.

Wî **ji** ber deynê xwe **va** bax firût.

**Ji** min **va** nêye dîtin.

**Ji** aliyê min **va** çû.

**Ji** dêl min **va** bixwe.

**Ji** pê me **va** nanê nivro xwarin.



**ji ... da ( de)**

این حرف اضافه بیشتر معنی مکان و یا طرفی که یک حرکت از آن شروع می شود می دهد.

**Ji** aliyê min **da** rahet bibe.  
از طرف من راحت باشید.

**Ji** wê rojê û vir **da** min ew nedîtiye.  
از همان روز به این طرف من ایشان را ندیدم.

**Ji** jor **da** dihate jêr.  
از بالا می آمد پایین.

**Ji** wir **da** hat.  
از آنطرف آمد

Roja xweş **ji** sibêh **da** xweş e.  
روز خوش از همان صبحش خوش است.

**Ji** vir **da** çû.  
از اینطرف رفت

**ji ber**

**Ji ber** çî.  
برای چی؟

**Ji ber** vê yekê.  
بخاطر این یکی.

**Ji ber** ku.  
برای اینکه.

**Ji ber** xwe.  
از پیش خود.

Rojînê mêwe **ji ber** me bir.  
روژین میوه ها را از جلوی ما برد.

**Ji** niha û pê **da** ez ê bi kurmanji binivîsim.  
از حالا به بعد من به کُرمَنجی خواهم نوشت

Cecoxanê kawî şûr **ji ber** xwe kişand.  
ججو خان کواانلویی شمشیر را از جلوی خود در کشید.

**Ji ber** çî tu nehatî.

Kambîz **ji ber** bavê xwe **va** rabû.

Ez **ji ber** wî **va** çûm Qoçanê.

Me berx **ji ber** şîr **va** kirin.

Em **ji ber** wî rabûn.

Min Kambîz **ji ber** Daniyal **va** şand dûkanê.

**Ji ber .... ra**

**ji dêl** (ji şûna) xweşiyê, te dilê me **ji** qeman (xeman) û qusan dagirtiye.

**Ji bin**

Destê xwe **ji bin** kulavê xwe derîne.  
دست خود را از زیر نمد خود بیرون بیاور.

**Ji bin ..... da (de)**

Ava befiredîla zozana Gulîlê **ji bin** herdê **da** berve Şîrwanê diherike.  
آب برفگاه (برف انبار) کوهدشت گلیل از زیر زمین بطرف شیروان جاری است.

**Ji bin ... va**

**Ji bin** pirê **va** redbû.  
از زیر پل رد شد.

**sewa/sa/seva(Seba/sebo/sebona/ Ji bo/ ji boy/ ji bona/bona/ ji boyina)**  
برای - (بیشتر معنی یک آرمان یا سبب و انجامی را نشان میدهد)

**Sa (Ji bo)** min ew tiştêkî rind e.  
برای من آن یک چیز خوبی است.

Ez ê **sa (ji boy)** xizanê xwe karbikim.  
Gula ku min çinî **sewa (ji bo)** te ye.  
Pezê nêr **sewa (ji bo)** firotinê ye.  
**Ji bo** vê yekê ew nikare bêbû.  
**Sewa (ji bo)** hinek karên siyasî ew hate girtin.  
**Ji bona** Xwedê kar dike.  
Bavo **sa** min **ra** jî kirasek kirî.  
Ez **sewa** te hatim.  
**Ji bo** te ez hatim.  
**Sewa** te ez hatim.  
**Ji bo** ku em dereng hatin, em nêliştin hundir.

**Ji nav**

hirç **ji nav** daran derket.  
Mîn ev (va) kitaba **ji nav** yên din hilbijartiye (intixab kirîye).

**Ji paş**

**ji paş** xaniyê me av diherike.

**Ji pişt ...**

**Ji pêş ...**

**Ji ser**

Min rojname **ji ser** mîzê rakir.

**Ji îro pê va** tukes **ji** wan **li vir** namên.

**Ji diho û vir da** tukes **ji** wan **li wir** neman.

**Ji cem** min çû.

**Ji aliyê ...**

**Ji derva ...**

**Ji der ...**

**Ji dêl (ji şûna) ...**

**Ji hev ...**

Ez wan **ji hev** nas nakim.

Min ewna **ji hev** daxistin.

**Li** در

(این حرف اضافه معمولاً در جلوی اسم یک مکان قرار می‌گیرد و مانند در آن مکان را نشان می‌دهد)

Ez **li** şehri Şîrwanê kar dikem.

من در شهر شیروان کار می‌کنم.

Îro **li** mala me dawet e.

امروز در منزل ما عروسی است.

Nan **li** ku ye? Nan **li** nav nandanê ye.

نان در کجاست؟ نان در داخل ناندان است.

Daniyal **li** mala apê xwe ye.

دانیال در منزل عموی خود است.

Kevçî **li** ku ne? **Li** aşpîxanê ne.

قاشقها در کجا هستند؟ در آشپزخانه هستند.

Rojîn **li** nav baxçe (bêxçe) ye.

روژین در داخل باغچه است.

Şagird **li** debistanê ne.

دانش آموزان در مدرسه هستند.

Daniyal **li** kemañçê dixê.

دانیال کمانچه می‌نوازد.

Bavo **li** kelê ye.

پدر در روستا است.

Rojîn **li** Şîrwanê ye.

روژین در شیروان است.

Kevok **li** ser darê rûniştîye.  
کبوتر روی درخت نشسته است.

Rojîn **li** debistana me dixwîne.  
روژین در مدرسه ما درس می خواند.

Çûçik **li** hewa difire.  
گنجشک در آسمان پرواز می کند.

Kî **li** mala we ye.  
کی در منزل شما است؟

Sinemxanim **li** wir namîne, dê / ê here mala meta xwe.  
صنم خانم در آنجا نمی ماند، به منزل عمه خود خواهد رفت.

Daniyal piştî serşuştinê kincên xwe **li** xwe dike.  
دانیال بعد از سرشویی لباسهای خود را می پوشد.

Çavê **li** derîyan, xwelî **li** serîyan.  
چشمی که در درب دیگران باشد، خاک بر سر است.

Ev kirasa lê (**li** wî / wê) datêye.  
این پیراهن به ایشان می آید.

**Li** welatê me zebeş (qerpûz) pir şêrîn dibin.  
در ولایت ما هندوانه خیلی شیرین می شوند.

Pez **li** hêveronê de rind diçêre.  
گوسفند در روشنایی نور ماه (مهتاب) خوب می چرد.

**Li** mala me tu xwarin nemaye.  
در منزل ما هیچ غذایی نمانده است.

**Li** kela me darên sêvan, gîlasan û gwîzan hene.  
در روستای ما درختان سیب، گیلاس و گردو وجود دارند.

Şagird **li** debistanê ders dixwînin lê bi zimanê Kurmanjî nine.  
دانش آموزان در مدرسه درس می خوانند اما به زبان کردی (کُرمَنجی) نیست.

Barê kêmaqilan **li** pišta baqilan e.  
بار کم عقلاں رو دوش عاقلان است.

Kêwanî (kedbanî) **li** mal e.  
کدبانو در منزل است.

Zebeş (qerpûz) **li** Deregezê çêdibin.

هندوانه در درگز تولید می شوند.

Neft hem **li** Qoçanê û hem jî **li** Razê heye.

نفت هم در قوچان و هم در راز (شمال بجنورد) وجود دارد.

Cilşo û feraşo (firaqşo) ya me **li** aşpijxanê (pijxanê) ne.

ماشین لباسشویی و ماشین ظرفشویی ما در آشپزخانه است.

Em **li ser** rewşa kurdên xorasanê gepdiken (diaxifin / dipeyivin).

ما بر روی وضعیت کردهای خراسان صحبت می کنیم .

Ez **li** vir im.

Mîn lê (**li** wê / wî) pirsî.

Ez **li** vê derê dijîm.

Ez **li** wî şehîrî najîm.

Rojîn **li** mal e.

Hêsp xwe **li** avê xist.

Ez diho **li cem** te bûm.

**Li** şeran xal û xwarzî, **li** xwarinan ap û birazî.

Çavê min **li** te ye.

Mîn ji Rojînê **li** te pirsî.

Heyfa ciwaniyê, pîrî **li** pey ye.

Heyfa heyveronê (hîveronê), şereş **li** pê (pey) ye.

Ez lê (**li** pezê xwe) digirim.

Ew **li** mala me ye.

**Li** kitabê temaşe bike.

Mîn **li** dêya xwe pirsî.

Heke tu lê (**li** wê / wî) guh nedî, ez ê **li** te xim.

Hespê me pînek lê (**li** wê / wî) xist.

**li ba** min e.

**Li cem** min e.

**Li bal** apê xwe dihat .

**Li ba** min **va** bû, lê diho çû.

Way **li** mino !      Way **li** minê !

Wax **li** mino !      Wax **li** minê !

## Li ber در جلوی

Rojîn **li ber** pencirê ye.  
روژین خانم در جلوی پنجره است.

Şîv û pîvaz **li ber** Daniyal in.  
شام و پیاز در جلوی دانیال است.

Sêvek **li ber** Rojînê ye.  
یک سیب در جلوی روژین است.

Mala yekî ar (agir) girtibû, yê din ser û pê **li ber** dikizirand.  
خانهء یکی آتش گرفته بود، آن دیگری در جلوی آن کله پاچه جزغال می داد (موی زدایی با شعله آتش).

Ez **li ber** derî (dêri) me.  
**li ber** mirinê ye.  
**Li ber** şîxan disekinîn.  
**Li ber** nanê xwe penîr dixwe.

Mamoste **li ber** textereş e.  
معلم در جلوی تخته سیاه است.

Daniyal **li ber** pêz e.  
دانیال در جلوی گوسفند است.

Ev gotina **li ber** xelkê eyb e.  
**Li ber** xwedê gerîyan.  
**Li ber** xwe ketin.  
**Li ber** xwe dan.

Rojînê giliyê (gazyê) birayê xwe **li ber** dayika xwe kir.  
Bi saetan **li ber** derî bendîxanê (zindanê) sekinîm.

## Li bin در زیر

Pişîk **li bin** mîzê da raketîye.  
گره در زیر میز خوابیده است.

Rojîn **li bin** sîya darê rûniştîye.  
روژین در زیر سایه درخت نشسته است.

Av **li bin** qewaxê berif bûye.  
آب در زیر غار (تاق سنگی) جمع شده است.

**Li bin** vî kevira dûpişk (dûpişt / dûmeqesk) hene.  
در زیر این سنگ عقربها هستند.

Were **li bin** darê rûne.  
Wê **li bin** darê sêv kom dikirin.  
Xelko, bavê te **li hundir** e.

Çûçik **li bin** asmîn **da** difirin.  
گنجشکها در زیر آسمان پرواز می کنند.

Rojîn **li bin** sîya darê rûnişt.  
روژین در زیر سایه درخت نشست.

Marê reşbelek **li bin** bûte ye.  
مار سیاه و سفید در زیر بوته است.

Otobos **li nav** rê xerab bû.  
 Ew **li nivê** rê da man.  
**Li jor** Qoçanê bayekî hênik (hênik) dihat.  
 Ez **li jêr** im.  
 Kela me **li cîhekî dûr** e.  
 Mala me **li nêzîkê** mala wan e.  
 Va sala **li min** nêye.  
 Deynê (qerzê) te **li kê** ye.  
 Guleya (guļa) te **li çi** ket.  
 Tu **li ku** derê bûyê.

### Li kêlek      کنار – در کنار

Rojîn **li kêleka** Daniyal e.  
 روژین در کنار دانیال است.

Gulperî **li kêleka** min e.  
 گلپری در کنار من است.

Kî **li kêleka** min e.  
 کی در کنار من است.

Mamosta **li kêleka** şagirdan e.

**Li cem ...**  
**Li nav ...**  
**Li ser ...**  
**Li ser ... va**  
**Li hev ...**

Vê tifangê ji min ra **li hev** siwar bike.  
 Ew **li hev** hatin.  
 Ew **li hev** çûne.

### Li ku      در کجا

Şivan **li ku** ye?  
 چوپان در کجاست؟

Cotkar **li ku** ye?  
 شخم کار (زراعتکار) در کجاست؟

Şivan **li ber** pêz e.  
 است چوپان در جلوی گوسفند.

Cotkar **li ser** zeminê ye.  
 زراعتکار در روی زمین است.

Mamosta **li ku** ye?  
معلم در کجاست؟

Mamoste **li** debistanê ye.  
معلم در مدرسه است.

Eminye **li ku** ne?  
ژاندارمها (ماموران امنیتی) در کجا هستند؟

Ew **li** qereqûl in.  
آنها در پاسگاه ژاندارمری هستند.

Polîs **li ku** ne?  
پلیس ها در کجا هستند؟

Ew **li** polîsxañê ne.  
آنها در اداره پلیس (پلیس خانه) هستند.

Kevjal **li ku** ne?  
خرچنگها در کجا هستند؟

Kevjal **li nav** avê ne.  
خرچنگها در داخل آب هستند.

### در پشت (paşîya) **Li paş**

Sêv **li paşîya** hêkê ye û her du **li ser** mîzê ne.  
هستند سیب در پشت تخم مرغ است و هر دو در روی میز.

Pirtiqal **li paşîya** hirmîyê ye.  
گلابی است پرتغال در پشت.

Daniyal **li paş** kampiyûtirê ye.  
پشت کامپیوتر است دانیال در.

Gulperî **li paş** min e.  
سر من است گلپری در پشت.

Kela me **li paş** çiyayî Gulîlê ye.  
روستای ما در پشت کوه گولیل است.

**Piştî** vê yekê tukes **bi** te bawer nayîne.  
بعد از این یکی هیچکس به تو باور نمی کند.

Xwe **li paş** mehêle.



## Li pêş ( pêşîya ) در جلوی

Qelem **li pêş** kitabê ye.  
قلم در جلوی کتاب است.

Şagird **li pêş** mamoste ye.  
دانش آموز در جلوی معلم است.

Kî **li pêşîya** te ye.  
کی در جلوی تو است؟

Dergistî ya min **li pêş** pencîrê ye.  
نامزد من در جلوی پنجره است.

Herwext **li pêş** rêzê bû.  
هر زمان در جلوی صف بود.

Nêrî **li pêşîya** **kerîyê** pêz serkêş e.  
بز نر در جلوی گله گوسفند پیشتاز است.

**Kela** me **li pêş** çiyayî Gulîlê ye.  
روستای ما در جلوی کوه گولیل است.

## Li ser روی، در بالای

Qelem **li ser** kitabê ye.  
قلم در روی کتاب است.

Kitab **li ser** mîzê ye.  
کتاب بر روی میز است.

Sêv **li ser** darê ye.  
سیب در روی درخت است.

Ez **li ser** rê **bi** rê **va** terim.  
من در روی راه پیاده روی می کنم.

Qerewûl (qerentû / dîdiwan) **li ser** palûz e.  
مترسک در سر جالیزار (پالیز خربزه و هندوانه) است.

Qereqûl û eminye **li ser** rêya me ne.  
پاسگاه و ژاندارمهای امنیتی در سر راه ما هستند.

Nan **li ser** sêlê tê patin.  
نان در روی صفحهء نان پزی (صفحه چدنی) پخته می شود.

Meymûn **li ser** darê ye.  
میمون بر روی درخت است.

Berf **li ser** çîyan zor û zehf e.  
برف در روی کوهها زیاد و فراوان است.

Teyr (têr) **li ser** asmîn difire.  
عقاب در روی آسمان پرواز می کند.

Berçavka (ayneka) te **li ser** taxçê ye.  
عینک شما در روی تاکچه است.

Desgirtî ya min **li ser** tevnê rêş (rîs) xav dike.  
نامزد من در روی دستگاه بافندگی (فرش بافی) پشم می ریسد (پشم یک لا می کند).

Pezkovî **li ser** zinarê ye.  
گوسفند وحشی (شکاری) در روی صخره (تخته سنگ کوه) است.

Gul û giya **li ser** kanîyê hêşin dibe.  
گل و گیاه در روی چشمه می روید.

Du minminîk (perperîk) **li ser** gula sor rûniştine.  
دو پروانه در روی گل سرخ نشسته اند.

Ez kitabek **li ser** kurdên xorasanê dinivîsim.  
Ez **li ser** vê qerarê hatim.  
**li ser** kebaban **va** çû, **bi ser** harehara keran **va** bû.  
Ez **li ser** xwe nînim.  
Tu **li ser** darê çî dikî.  
Kî **li ser** ferşê (xalî / qalî) rûniştiye.

**bin** زیر

Keçik çûne **bin** dûrikê / darikê.  
دخترها به سیاحت گروهی (زیر درختان محله) رفته اند.

Baran barî û lê ket **bin** xanîyê me.  
باران بارید و سیل به زیر خانه ما افتاد.

Goga Rojînê ya reşbelek **li bin** darê ye.  
توپ سیاه و سفید روژین در زیر درخت است.

Av diherike û dikeve **bin** herdê.  
آب حرکت می کند و می رود زیر زمین.

Malên koçeran **li bin** xeta serhedê danîn.  
کاروان کوچروها در زیر خط سرحد (نوار مرزی) اتراق کردند.

Nalbend **bin** simî hêsp nal dike.  
نعلبند زیر سم اسب را نعل می زند.

**ber / berî** جلوی

**Li ber** avê nesekin / mesekin.

در جلوی آب نایستید.

Manga me **ber** avêt.

گاو ما گوساله اندازی کرد (جلو تر از وقت زایمان).

Bizina ask (sor û reş) **li ber** şivîn za.

بز ابرش (چند رنگی/ سرخ و سیاه) در جلوی چوپان زاید.

Pûng **li ber** kuna mêr hêşin dibe.

پونه در جلوی سوراخ مار می روید.

Koçerên êla Kawan **ber bi** Mirawe Tepê **va** bi rê ketin.

کاروان کوچرو ایل کاوانلویی به طرف مراوه تپه به راه افتادند.

**Berî** her kesî ez hatim.

قبل از هر کسی من آمدم.

Wan her duyan da **ber** hev.

Wekî here **ber** mirinê.

**Berî** nîvro ez ê bêbim.

**Berî** ku ez bihatima ew çû.

**Ber bi** jûr **va** diçû.

**Ber bi** êvarê **va** diçû.

**Ber bi** xêr be.

**Ber bi** min **va** dihat.

مروری بر تعدادی دیگر از حروف اضافه که می شود نام برد از قبیل:

**mîna, nola, nala, nata, wek, heta, li gorî, li gel / li cem, ji bo, ji ber, piştî, berî, tenê, dû, ...**

Ez jî **wekî (nata)** te zû rabûm.

من هم مثل شما زود بلند شدم.

Berx **li dû** maka xwe ye.

بره بدنبال مادرش است .

Li rêkoçan dê û dot ketine **dû** hev.

در کاروان کوچرو مادر و دختر بدنبال هم راه افتادند.

Qirik **mîna** kewê nikare bi rê here.

کلاغ نمی تواند مثل کبک راه برود.

jîyan **bi tenê** nabe (dişwar e.

زندگی به تنهایی نمی شود (دشووار است).

Danîyal jî **nata** bavê xwe pozbilind e.

دانیال هم مثل پدرش مغرور (دماغ بلند) است .

Ew **heta** ku tere (dice.

ایشان تا به کجا می رود؟

**Li gorî** wî her tişt rast e.

در نظر ایشان همه چیز درست است.

Were **li cem (li gel)** min demekê rune.

بیا در کنار من کمی (مدتی) بنشین.

**li nav** giştan (kuliyan), min tu hilbijartî.

## Li navbeyna / ji navbeyna -- ji navbêna / li navbêna -- li navbera/ ji navbera

Ez diçim **nav** kelegîyên (gundiye) xwe.

Ez çûm **paş** xênî.

**Di paş** xaniyê me **da** kanîyek heye.

Du gur **di paş** şivîn **ra** redbûn .

Tu here (biçe) ez ê **paşê (pişt ra)** bêbim.

**li paş** xanî me dar hene.

min da **pey** wî.

Em **ji pey** wan hatin.

**pêş** min ronahî ye.

**Pêş** min **da** pez heye.

**Di pêşiya** min **da** av diherike.

Bêbextiya xwe **di pêş** çavê min kir.

Ķela me **di pişt** çiyê Gulîlê **da** ye.

Bijnûrd **li navbeyna** Esperayînê û Şîrwanê ye.

Hestîyê hêtê, piştmazi û du parsû yên wî **di navberê ra** şikestine.

Ez **di pişt** xaniyê we **ra** redbûm.

Ez ê **di pişt** xwe **va**, jin û xizîn bihêlim.

Ez **li şûna** wî hatime.

**Li şûna** ku ez rûniştibûm.

**Li nav** baxê wan **da** darên: bîyê, spîdar, hirmî, gwîz (gûz), sêv, gîlas, badem, alûçe, bihî, tirî (tirih), şeftalû, zerdalû, xurme, zeytûn, lîmû, tût, hencîr û çinar hene.

در داخل باغ آنها این درختان وجود دارند: بید، سپیدار، گلابی، گردو، سیب، گیلان، بادام، آلوچه، بهی، انگور، هلو، زردالو، خرما، زیتون، لیمو، توت، انجیر و درخت چنار .

دانش آموزان، دانشجویان، نویسندگان، فرهیختگان، پیشکوتان و تمامی فعالین کُرمَنج و مردم شریف و بزرگوار منطقه کُرمَنج (شمال شرق ایران) امیدوارم که همه با هم به نوشتن به زبان مادری خود اهمیت بدهیم. زنده بودن زبان محاوره ای و نوشتاری یک ملیت یعنی زنده بودن و ماندگار بودن آن ملیت.

## درس چهارم

ادامه حروف اضافه

**Dewama Daçekan**

حروف اضافه درملیس کردن کلمات (یامسلح کردن و آماده کردن جمله جهت عرضه بیانی نرم، روان و فصیح)، آذین بندی و آراستن مصاحبت نقش خود را ایفا می کنند. همانطور که در درسهای قبلی بیان شد حرف اضافه یک کلمهء تغییر ناپذیر و ثابت است.

حرف اضافه به تنهایی معنی خاصی نمی دهد و بدون حرف اضافه، جمله بندی و صحبت کردن بسیار مشکل است. عبارت دیگر حروف اضافه درملیس کردن کلمات (یامسلح کردن و آماده کردن جمله جهت عرضه بیانی نرم، روان و فصیح)، آذین بندی و آراستن مصاحبت نقش خود را ایفا می کنند. بهمین خاطر حروف اضافه را Daçek می نامند.

Çek (لباس، سلاح)

Daçek > çekdar kirin (Dan bi çek kirin)

وقتی که دو حرف اضافه با همدیگر بکار روند، و یا همچنین اگر با حرف اضافه her یک حرف اضافه دیگر و یا شماره ای و عددی، اسمی، واژه یک یا دو سیلابی قرار بگیرند، در آن هنگام این دو حرف اضافه ترجیحاً بهتر است که با همدیگر نوشته بشوند. به مثالهای زیر توجه کنید:

An ku > anku

Gotina rast sondê naxwaze anku (yanku) derewîn serî bi ard be jî jê bawer naken  
حرف راست سوگند نمی خواهد یعنی اینکه اگر دروغگو سرش آردی هم باشد باور نکنید که از آسیاب می آید

Yan ji > yanji

Ya dil bila di dil da bimîne yanji te ra jî nabêjim

مال دل بگذار در دل بماند یعنی به تو هم نمی گویم

Her wekî > herwekî همانطور

Herwekî ku aşkar e bê şik Tilivîzyonek jibo Kurmancên Xorasanê lazim e  
همانطور که آشکار است بدون شک و شبهه یک تلویزیون برای گُرمانجیهای خراسان لازم است

Ji ber > jiber

Ji bo > jibo

Her dem > herdem

Her çar > herçar

در این جلسه، حروف اضافه را با همدیگر مرور و بازبینی می کنیم. بطور کلی و بطور خلاصه در دستور زبان و ادبیات کردی - گُرمانجی، حروف اضافه را گاهاً به انواع زیر نیز تقسیم بندی کرده اند:

- |                                  |                                 |
|----------------------------------|---------------------------------|
| ۱ - حروف اضافه فعلی (افعال مرکب) | ۵ - حروف اضافه منفی             |
| ۲ - حروف اضافه حالت              | ۶ - حروف اضافه پرسشی (استفهامی) |
| ۳ - حروف اضافه اسمی              | ۷ - حروف اضافه استدلالی         |
| ۴ - حروف اضافه مثبت              | ۸ - حروف اضافه توضیحی.          |

۱ - **حروف اضافه فعلی:** این حروف اضافه بصورت پیشوند در جلوی افعال قرار می گیرند و افعال مرکب را درست می کنند ( اگر حروف اضافه در جلوی اسم قرار بگیرند حروف اضافه مرکب را درست می کند که در جلسه قبل بیان شد). به مثالهای زیر در خصوص افعال مرکب توجه کنید:

**Ba** - Badan, babir, bakêş, bagerok, babidest, bapêç, bapêketî, bawêşîn

**Ber** - Bexistin, berdan, bernas, beravêtin, bergerîn, berhevdan, bergirtin, berketin

**Bin** - Binketin, binçavkirin, bindestbûn, binzik, binherdî

**Çê** - Çêkirin, çêrandin, çêbûn

**Da** - Dagirtin, darevandin, daxistin, dakişandin, dakirin, daqurtandin, daketin, daçilkandin, dagerandin, dawêşandin, dawestandin

**Der** - derkirin, derxistin, deranîn, derçûn, derketin

**Dû** - Dûketin, dûkêş, dûmeqes (dûpişt, dûpişk), dûman, dûdirêj

**Hil** - Hildan, hilgirtin, hilkişandin, hilpişkîn, hilweşandin, hilbijartin

**Hin** - Hingavtin, hindikandin, hingaftin, hinartin

**Hev** - Hevgirtin, hevhatin, hevexistin, hevkarî, hevdengî, hevdîtin, hevpişe

**Jê** - Jêkirin, jêxistin, jêhatin, jêbirîn, jêkişandin, jêbûn, jêderxistin, jêgirtin, jêketin, jêkêmkirin, jêqûlkirin, jêçûn, jêxwarin, jêzan

**Lê** - Lêgerîn, lêxistin, lêçûn, lêhatin, lêpîrsîn, lêrastbûn, lêkolîn, lêhildan, lêkirin, lêbûn, lêdanîn, lêhûrbûn, lêkûrbûn, lêniştin, lêfikirîn, lêpêçan, lêsiwarkirin, lêşikandin, lêzivirandin, lêketin, lêmişt, lêker

**Lev (Lihev)** - Lihevhatin, lihevçûn, lihevdan, lihevkirin, lihevexistin, lihevketin

**Nav** - Navdan, navnivîsîn, navberî, navend, navnişan, navkirî, navzirav, navbeynî, navdarî, navçe

**Pê** - Pêvedan, pêhesîn, pêketin, pêmaîn, pêxwas, pêxistin, pêçan, pêkenîn, pêveçûn, pêwendî, pêxwar, pêgirtin, pêxwarin

**Pey** - Peyketin, peyhevî, peydakirin, peywendin

**Pêş** - Pêşketin, pêşgotin, pêşveçûn, pêşgirtin, pêşdebirin, pêşexistin

**Pev (bihev)** - Pevçûn, pevdeng, pevgirêdan, pevxistî, pevguherîn, pevguhgirtin

**Ra** - Raketin, rakirin, rabûn, raxistin, rawestîn, rakişandin, ramîsan, rapêçandin (rajor, rajêr, raber, raser)

**Rê** - rêkirin, rêxistin, rêçûn, rêvabirin

**Rû** - Rûniştin, rûken, rûçikandin, rûdan, rûbar, rûkirin, rûnivîn, rûqermiçî, rûreşî, rûsarî, rûsipî, rûşûştî, rûtirşî, rûgirtî, rûmet, rûpel, rûxandin, rûxweşî

**Ser** - Serketin, serastkirin, serberjêr, serberzî, serbilind, serçavî, serdan, serdestî, serhildan, serhatin, serhişkî, serkanî, serjimarî, serkêş, sernixûn, sernivîskar, serperest, serxwebûn, serxweşî



**Tê** - Têdan, têketin, têderxistin, têfîrandin, têgerandin, têhildan, têçûn, têkirin, têrakirin, têwerdan, têwerkirin, têxistin, têgihîştin, têbînî

**Tev** - Tevdan, tevgerîn, tevger, tevlihevî, tevlihevbûn, tevkar, tevqirkirin, tevizîn

**Ve** - Vexwarin, vegirtin, vemirandin, vebûn, vedan, veketin, vegerîn, veciniqandin, vekirin, vekişandin, veqetandin, vereşandin, veşartin, vereşîn, vebirûskîn

**Vê** - Vêxistin, vêketin, vêranî, veçinîn, vekolandin

**Wer** - Wergerandin, weranîn, werzişkirin, wergirtin, werkirin

**Î** - îşev (ev /vê /va şeva), îsal (ev /va /vê sala), îro (ev /va roya), îcar (ev /vê /va cara)

این شب (امشب)، این سال (امسال)، این روز (امروز)، این دفعه

۲ - **حروف اضافه حالت:** این فرم از حروف اضافه در تغییر حالت زمانی افعال بکار می روند.

**الف - حروف اضافه برای حالت زمان حال :**

**di** برای درست کردن فعل زمان حال

Dil ji dilan hez **diken**.

Ez **diçim** debistanê.

**ب - حروف اضافه برای حالت زمان آینده :**

**ê (dê, wê, tê)** برای درست کردن زمان آینده

Ez **ê** herim (biçm) debistanê.

من به مدرسه خواهم رفت.

Bavo **ê** kînga (kengê) vegeri.

پدر کی برخواهد گشت؟

**Tê** (tu **ê**) îsal terî merasim û kombûna Jeferqulî Zinglî.

شما امسال به مراسم و گردهمایی جعفرقلی زنگلی می روید؟

Ew **wê** sibeh bêbe vir.

ایشان فردا به اینجا خواهد آمد.

Sibeh **dê** (**ê**) bibe 25,ê meha 6,an ya sala 2010.

فردا ۲۵ ام ماه ۶ ام از سال ۲۰۱۰ خواهد شد.

## پ - حروف اضافه برای حالت امری :

**bi** برای درست کردن فعل حالت امری

**Bilezîne** li me dereng e.

عجله کن دیرمان شد.

**Bilive** dereng bû.

بجنب دیر شد.

**Bireve!** bavo hat.

فرار کن! بابا آمد.

**Metirse!** ez li cem te me.

نترس! من پیش تو هستم.

**Bike**

**Meke**

## ت - حروف اضافه برای حالت بلانی فعل :

**Bila**

**Bila** dilê te xweş bibe.

بگذار دلت سالم باشد (معمولاً به کسی که عزیزش را از دست داده است، می گویند).

**Bila** diz hebin, şereş pir in.

بگذار دزدها باشند، شبهای تاریک زیاد هستند (کنایه از رشادت است).

Rindîyê bike **bila** rindî bêbe pêşîya te.

خوبی کن تا خوبی به پیشواز تو آید.

**Bila** ew mêr be, li ber çavê neyar û dişmen (dijmin) be.

بگذار آن مرد باشد، جلوی چشم بدخواه و دشمن باشد.

**Bila** baran bibarîya, bira em şil bibûana.

بگذار باران می بارید، بگذار ما خیس می شدیم.

Xwedê yar be **bila** dinya kulî neyar be.

اگر خدا با ما یار باشد بگذار همه با ما یار نباشند.

Xwedê yar be **bila** şûr ji dar be.

اگر خدا با ما یار باشد بگذار شمشیر از چوب باشد.

## ج - حروف اضافه برای حالت شرطی فعل :

**Eger** (ger, er, ege), **ku** گر همانطور، همانطور که **Wer** (wer **ku**)

**Heke** (heger, hek, heker) اگر تا، تا اینکه **Heta, heta ku**

**Belki** (belko, belkî, belkim, belku, belkê) شاید، احتمالاً

**Heta ku** ew bihata, em ê biçûna.

تا اینکه او بیاید، ما رفته بودیم .

**Heta ku** wê pîrejinê negota, wan tiştekan nadikir.

تا که آن پیر زن نمی گفت، آنها چیزی نمی کردند .

**Heta ku** rûyê (mirûzê) xwe tirş nekira, xizanê wî nadisekinîn.

تا موقعیکه ترش رویی نمی کرد، بچه های او ساکت نمی شدند .

**Eger** (heke) ew dilşad bûya, ez jî dibûm.

اگر ایشان دلشاد می شد، من هم می شدم .

**Heke** (eger) baran bibarîya, min ê baranîyê xwe bianiya.

اگر باران می بارید، من کت بارانی خود را می آوردم .

**Eger** (heke) me kar bikira, me yê hinek dirav bidaya te.

اگر ما کار می کردیم، ما مقداری پول به شما می دادیم .

**Ege** (heke) min kevir biavêta, çûçik giştê bifirîyana.

اگر من سنگ را پرتاب می کردم، همهء گنجشکها می پریدند .

**Belkî** min ew kitaba xwendibe, Helbet ku te ew xwendîye.

شاید من آن کتاب را خوانده باشم، البته که شما آن را خوانده اید .

**Eger** ew li vira nebûya, em ê biçûna.

اگر او در اینجا نمی بود، ما می رفتیم .

**Eger** em zû raketina, em ê zû rabûna.

اگر ما زود می خوابیدیم، ما زود بیدار می شدیم .

**Eger** (heker) me weqes rû nedaya wî, li me haka (wisa) nadikir.

اگر ما آنقدر به ایشان رو نمی دادیم، به ما این جور نمی کرد .

**Çer ku** ew bihatina, em ê biçûna.

بمحض اینکه آنها می آمدند، ما می رفتیم .

Ew hevalê **ku** min dît, Kurmanj e.

آن دوستی که من دیدم، کُرمَنج است .

Tiştin **hene ku** tu pê nizanî.

چیزهایی هستند که شما آنها را نمی دانید .

**Eger** te weqes gepnekira, ew ê aciz nebûna.

اگر تو آنقدر صحبت نمی کردی، آنها خسته نمی شدند .

**Ger** ew çavteng nebûya, min ê jê bixwesta.

اگر او چشم تنگ نبود، من از ایشان درخواست می کردم .

**Eger** ez biçûma debistanê, ez ê qebûl bibûma.

### د - حروف اضافه برای حالت آرزویی فعل :

**Dibê** (divê, divîya) می شود، بایستی (حالت آرزویی و بایستن دارد)

**Nabê** (nave) نباید (حالت آرزویی و نبایستن دارد)

**Gerê** بایستی

**gerek** لازم بودن، بایستی

**dibi** (dibe, dibit) ممکن است / شاید / احتمالاً

**dibi ku** (dibe **ku**) ممکن است که

**Dibi ku** ez jî bêbim.

ممکن است که من هم بیایم

Ez **gerê** herim.

من باید بروم

**Divê** ew bêbe.

بایستی(ایکاش) او بیاید

**nabê** ez li vira bimînîm.

نمیاید (نمی شود) من در اینجا بمانم

**Dibê** ez herim.

می شود که (بایستی) من بروم

**navê** tu herî.

نمیاید (نمی شود) شما بروید

**Divê** tu nerevî.

می شود که (بایستی) تو ندوی

**Dibi ku** çûbûne dûkanê.

ممکن است که به مغازه رفته باشند

**Divê** mirov (adem) bûkê li hespê nêr siwar bike.

آدم بایستی عروس خانم را روی اسب نر (نریان) به خانه بخت بفرستد (خوشبختی)

**Eger** (heke) ez jî **gerek** bibim, ez ê bêbim.

اگر من هم لازم بشوم، من خواهم آمد

۳ - حروف اضافه اسمی: این حروف اضافه، اسامی را ملبَس، تصریف و سلیس می کنند.

### Bi, di, ji, li

Ez **ji** kelê têm.

من از روستا (قلعه) می آیم .

Ewr **li** asman çêdibin.

ابرها در آسمان درست می شوند .

Min **ji** wî re got.

من به ایشان گفتم .

Firoke **li** asman difire.

هواپیما در آسمان پرواز می کند .

Zor gizêran **ji** herdê dikişîne.

زور هویج را از زمین می کشد بیرون.

Ez **di** Qoçanê ra çûm Bacgîran.

من از طریق قوچان به باجگیران رفتم.

Em **bi** rêya Bijnûrdê ra çûn Esperayînê.

ما از راه بجنورد به اسفراین رفتیم

**Bi** qirşî qalan û pirçî palan xanî çênabin.

با پوشال موشال و آشغال ماشغالها خانه درست نمی شود

Pîzpîzka Zirnê û Qoşmê **ji** qamîşan çêdibe.

صوت صوتک سرنا و قوشمه (جفت نی) از گیاه نی درست می شوند

Mêşî mêşî viz - viz **ji** te, hingiv **ji** min.

آهای مگس مگس، وز وز کردن برای تو عسل برای من

Ez par **li** Qoçanê û Kelatê bûm.

من پارسال در قوچان و کلات بودم .

Ard **bi** êlegê (hêlek, qelûr) tê bîtin (bêjîn / serend kirin).

آرد بوسیلهء الک غربال (سردند) می شود .

Şijî ya penîrê nuh (teze) **ji** parzin dirijîya nav teştâ mîsî ya qelay kirî.

آب پنیر تازه از طریق آبکش (پارچه نازک سفید رنگ) بداخل تنشت مسی قلع شده ریخته می شد.

Kurmanj **li** menteqa meşkan (bakûra Sewziwarê) û menteqa Serwilayetê

(bakûra rojava ya Nîşabûrê) jî zehf hene.

مردم کُرمَانج در منطقهء مشکان (شمال سبزوار) و منطقه سرولایت (شمال غربی نیشابور) هم زیاد هستند.

Kurmancên Serexsê û Layînê **ji** zimanê zikmakî ya xwe pir hez diken.  
کُرمَنجَهای سرخس و لایین زبان مادری خود را خیلی دوست دارند .

Ez kurmanjên Xorasanê qet ji bîrnakim û ruhê min bi wê derê girêdayî ye.  
من کُرمَنجَهای خراسان را هیچ وقت فراموش نخواهم کرد و روح من به آنجا گره خورده است

Hinek **ji** kelegî û koçerên kurmanc ên Xorasanê **ji** êş û jana bawî (bah, reşebah) gilî û gazî dikirin.  
تعدادی از روستائیان و ایلات کوچرو کُرمَنج خراسان از درد و رنج ناشی از روماتیسم گلایه می کردند.

از من است که بر من است (از ماست که بر ماست). **ji** mino **li** mino.

**Li hember** (hevber) çîyayi Hejarmeçîtê da çîyayê Şahîcanê (Şadîcan) ye, **li ser** wan wargehên koçeran hene, **di bin da** rûbara (rûdxana) Etrekê diherike, **li ber** rûbarê **da** şehre Qoçanê û welatê min tê dîtin.

درمقابل کوه هزارمسجد کوه شاهی جان (شادی جان) است، درروی آنها منزلگاه (اردوگاه) ایلات کوچرو هستند، درپایین آن رودخانه، اترک جاری است، درکنار رودخانه شهر قوچان و ولایت من دیده می شود.

۴- **حروف اضافه مثبت** : این حرف اضافه برای مثبت کردن یک جمله یا حالتی استفاده می شود.

**Belê, ê** (erê / herê), **êh, xa** (xwe, jixwe)

**Belê**, ez te nas dikem.  
بله، من شما را می شناسم.

**xa**, te got ku ez herim.  
خب (خودت)، گفتمی که من بروم.

**ê**, ez ji Qoçanê me.  
بله، من از قوچان هستم.

**ê** (**erê**), Rojîn hevala min e.  
بله، روزین دوست من است.

**êh** (**here**), ez alfabêya Kurdî dixwînim.  
بله، من الفبای کردی را می خوانم.

**xa** (**jixwe**) tu min nas dikî.  
از خود (همینجوری، علاوه بر این) تو من را می شناسی.

۵ - **حروف اضافه منفی**: این حرف اضافه برای منفی کردن استفاده می شود.

### **Bê, na, ni, nî, ne, nê, no, me, naxêr (nexêr)**

**Bê** te bigota min dizanîbu ku tu Kurd î.  
بدون گفتن شما، من می دانستم که شما کرد

Ez **nikarim** bê serxwebûn û azadî bijîm (zindigî bikem).  
من نمی توانم بدون استقلال و آزادی زندگی کنم

Ez **neçûm** lê ew hat.  
من نرفتم اما ایشان آمد

Gog li nav bêxçe **nîne** (**nine**).  
توپ در داخل باغچه نیست

Ez **naxwazim** bêhurmet bijîm.  
من نمی خواهم بی حرمت زندگی کنم

Bavo got wer **meke**.  
پدر گفت آنطور نکن

Ez **nizanim** kuda herim.  
من نمی دانم به کجا بروم

Bavo got îro derî dûkanê **ve**meke.  
پدر گفت درب مغازه را امروز باز نکن

**No**, ez te nas **nakim**.  
نه، من تو را نمی شناسم

Min av **venexwar**.  
من آب ننوشیدم.

**Naxêr**, ez bindestîyê qebûl **nakim**.  
نخیر، من زیردستی را قبول نمی کنم

Ez wê ji xewê **ranakim**.  
من ایشان را از خواب بیدار نمی کنم

Çima Danîyal **nêye** (**nayê**) mal.  
چرا دانیال به منزل نمی آید

Ez Kurmancên Xorasanê qet jibîr **nakim**.  
من کُرمَنجهای خراسان را هرگز فراموش نمی کنم

Şofirên menteqa Kurmanj ya Bakûra Xorasanê li zivistanê bi lez (zû) **najon**.  
راننده های منطقه کُرمَنج شمال خراسان در هنگام زمستان با سرعت رانندگی نمی کنند

پیشوند **na** فقط در زمان حال بکار می رود. معمولاً در حالت امری بجای پیشوند **ne** از پیشوند **me** استفاده می شود. پیشوندهای **ne, ni, na** اگر در جلوی فعل قرار گیرد آن فعل را منفی می کند، و از نظر املائی به فعل وصل می شوند. اگر بخواهیم اسم و یا صفت را در یک جمله منفی کنیم آنگاه این پیشوندها را در جلوی آن اسم و یا صفت می آوریم (اما از نظر املائی از آن اسم یا صفت جداگانه نوشته می شوند). (**nîê** حالت **tawandin** است برای **na** و **ni**) در جلسه آینده مبحث **tewandin** به تفصیل بیان می شود.

Bavo îro kar **nake**.  
پدر امروز کار نمی کند.

Ez **naçim** debistanê.  
من به مدرسه نمی روم.

Ev **ne** xanîyê me ye.  
این منزل ما نیست.

Wî karî **meke**.  
آن کار را نکن.

Şivan bi şev **ranakevin**.  
چوپانان در شب نمی خوابند.

Qelema min **ne** sor e.  
قلم من قرمز نیست.

Ev qelem (va qelema) **ne** dirêj e.  
این قلم دراز نیست.

**ne** xweş e.

**ne** rind e.

**ne** sêv e.

Bindestî **ne** xweş e.  
زیر دستی خوب نیست.

**meke**

**bike**

**merijîn**

**birijîn**

## ۶ - حروف اضافه پرسشی :

این حروف اضافه، برای درست کردن حالت سئوالی استفاده می شود.

**ka, kanê, kî, kîjan, ma, çi, çend**

**Çere** (çawa, çer, çito) چطور

**çima** (çira) چرا

**xelko** (gelo, tirê m)

**wer** (weha, weh, wa) اینطوری

**way** (wey)

**qe** آخه، آخر، تابحال، هرگز، همواره، هیچوقت

**qey** مثل اینکه، گویی که، فکر میکنم که، معتقدم که



**Çere** tu hatî vir.

چطوری به اینجا آمدی؟

**Qe** tu ji min çî dixwazî.

آخه تو از من چه می خواهی؟

**Qe** tu ku were.

حداقل (آخه) شما که بیایید؟

**Çere (çawa)** tu çûyî wir.

شما چطوری به آنجا رفتید؟

**Çima** tu li me napirsî.

چرا شما احوالی از ما نمی پرسى؟

**Xelko (tirêm)** ew çûye kuderê.

آهای جماعت، ایشان به کجا رفته است؟

**Qey** tu ji kelê tê.

می گویم (گویی که) شما از روستا (قلعه) می آئید؟

**Qey** tu neçûyî.

شما نرفتید؟ (فرم پرسشی)

Te digot **qey** ew mamosta ye.

شما فکر می کردید ایشان معلم است

Min digot **qey** ew mamosta ye.

من فکر می کردم ایشان معلم (دبیر) است

**Çer** ez herim mala wan.

من چه جوری به منزل آنان بروم؟

**Ka** mamosta.

معلم کو (کجاست)؟

**Way** li mino / minê.

وای بر من (زن / مرد)

Tu **çi** dibêjî.

Te **çi** kir.

Wî **çi** anî.

Saet **çend** e.

Saet **çi** ye.

Hûn **çend** salî ne.

**Çend** sêvan bide min.

**Çend** heb qend bide min.

**Çend** xweng û birayên te hene.

Eger (hek) **wer** bibe? (ku **weha** bibe?)

اگر آنطوری بشود؟

**Wer** dibe.

اینجوری می شود؟

**Ma** (**me**) ev a te ye?

آیا این مال شما است؟

**Ma** tu neçûyî debistanê.

آیا شما به مدرسه نرفتید؟

**Çima** Rojîn digirîye.

چرا روزین گریه می کند؟

**Ma** (**me**) tu li îstgah otobusê peya (pêde / pîyade) bûyî.

آیا شما در ایستگاه اتوبوس پیاده شدید؟

**Çima** xwezûrî rojînê hey xwezîya xwe dadiqurtînîye.

چرا پدر شوهر روزین خانم مکرراً آب دهانش را قورت می دهد؟

**Kanê** debistan û xwendin û nivîsîn a bi Kurmanji.

کجاست مدرسه و خواندن و نوشتن به کُرمانجی؟

**Ma** (**me**) tu sibe terî (diçe) dereki? A, ez ê herime Layînê.

آیا شما فردا به جایی میروید؟ بله، من به شهر لایین خواهم رفت.

Tu **çere** (**çawa**) dikarî weqes bigerî.

تو چطوری می توانی اینقدر بگردی؟

Nizanim **çima** îro dilê min hatiye girtin.

نمی دانم چرا امروز دلم گرفته است

۷ - **حروف اضافه استدلالی**: این حروف اضافه، سبب و دلایل انجام کاری را و یا حالت استدلالی و توجیهی آن را توضیح می دهند .

**Da / ta, daku / taku** تا، تا اینکه، برای اینکه  
**jiber, jiber ku, jibo, bo**  
**ku, çer ku**  
**sa (sewa, seba), saku**  
**sebeb (sedem)**  
**loma (lewma, lewre)**  
**çinku (çimkî)**  
**heta ku**

Ço /şiv rakir **da (ta)** lêxe Rojînê.  
 چوب دستی را بالا برد تا به روژین بزند

Ez **jiber** sitema şîxan derketim.  
 من از دست ستم شیخ ها آمدم بیرون .

Daniyl tifang kirî **daku** here / biçê nêçîrê.  
 دانیال تفنگ را خرید تا که به شکار برود.

**Jiber ku** welatê Kurdan bindest e, nivîsîn bi zimanê me jî, qedexê ye.  
 بخاطر اینکه سرزمین کردها زیر دست (حاکمین غیر کرد) است، نوشتن به زبان ما نیز قَدْغَن است.

**Jibo** pêş xistina zimanê kurdî yekitîyeke zimanzanan lazim (pêwîst) e.  
 برای پیشرفت زبان کردی یک تجمع و اتحاد زبان شناسان کرد لازم است.

Serxak û binxaka Kurdistanê talan dibe **loma** Kurd hejar û feqir in.  
 سرزمین وزیرزمین کردستان چپاول و غارت می شود بهمین خاطر کردها فقیر و بینوا هستند.

Kurd bûne bindest, **sewa ku** li xwe xwedî derneketine (werneketine).  
 کردها زیر دست شده اند؛ چونکه به خود ارزش نداده اند (بی صاحب)

Ew **sewa (sa)** min ra hat.  
 ایشان بخاطر من آمد.

Gerê ew pir zû bên **daku** em bigihêjin qetarê.  
 می بایستی آنان خیلی زود بیایند تا که ما به قطار برسیم.

Ez ê her tiştî bikem **daku** dilî wê xweş kim.  
من هر کاری خواهم کرد تا که دل ایشان را خوش کنم.

Ew hindik dixwe **daku** çax (qelew) nebe.  
ایشان کم می خورد تا که چاق نشود.

**Çer ku** wan em dîtin, bangî (bange, bane) me kirin.  
آنها بمحض اینکه ما را دیدند، ما را صدا کردند.

**Çer ku** ez bigihêjim wir, ez ê ji te ra tilifon bikim.  
بمحض اینکه به آنجا برسم، برای شما تلفن خواهم کرد.

**Berî ku** tu bigihêjî avê, derlingê xwe hilmede.  
قبل از اینکه به آب برسید، سر پاچه های خود را بالا نبرید.

Wan nedihîşt em bi kurmanjî binivîsin **daku** em gişt bibin Fars.  
آنها نمیگذاشتن ما به کردی بنویسیم تا که همه ما فارس شویم.

**Heta ku** ew hat, em çûn.  
تا که ایشان آمد، ما رفتیم.

Êzing **jibo** şewtandinê ne.  
هیزم برای آتش زدن (سوزاندن) می باشند

**Heta ku** ew bihata, em ê biçûna.  
تا اینکه او بیاید، ما رفته بودیم.

Werziş **sa** tendurustîyê لازم e.  
ورزش برای تندرستی لازم است

**Sa** çî ra dêri venakî? **Saku** kilît bi min ra nine (nîne).  
برای چه درب را باز نمی کنید؟ برای اینکه کلید آن با من نیست.

Ji dêlva **ku** (li şûna **ku**) radyoyê veke, tilivîzyon vekir.  
بجای آنکه رادیو را روشن کند، تلویزیون را روشن کرد.

Ademên **ku** dewlemend in (dara ne), kar nakin.  
آدمهایی که ثروتمند هستند، کار نمی کنند.

**Ku** ez çûbama welêt, ez ê kêfxweş bibama.  
اگر من به ولایت رفته بودم، کیف می کردم (لذت می بردم)

Tasa **ku** li der bimîne, se dihalêse.  
بادیه (کاسه فلزی) که در بیرون بماند، سگ لیس می زند

۸ -حروف اضافه توضیحی: کلماتی که در داخل پرانتز نوشته شده اند بسته به استفاده در مناطق مختلف کردنشین، باهم مشابه هستند.

**Ba, bal, belkî, bes, bese, cem, sipas, dîsa, êdî, gel, gor, her, heta**  
**heya, xa** (jixwe), **tewrî, tenê**  
**şabaş** (şewaş/ şadbaş) / **sipas**  
**hînga / hingê**      آنگاه  
**nêzik / nîzik**      نزدیک  
**loma** (lewma, lewre, lewra)      بخاطر این  
**mîna** (nata , nola, nala, wekî)      مثل  
**haka** (weha, wilo , wisa, wek)      اینجوری  
**xwastin** (xwezika , xwezî)      خواستن

**Êdî**      دیگه، دیگه هرگز، از این به بعد (مترادف êdî در لهجه سورانی nema است)

**Êdî** ez narim mala wan (carek din ez narim mala wan).

من دیگه به منزل آنان نمی روم .

Ez **nema** diçim mala wan.

من دیگه به منزل آنان نمی روم .

**Ku** xwedê bêje ” erê ” **êdî** kes nikare pêşîyê lê bigire.

اگر که خدا بگوید بله، دیگه کسی نمی تواند جلوییش را بگیرد.

**Êdî** (dî) bes e, weqes zilm û zor li ser Kurdan.

دیگر بس است، این همه ظلم و زور روی کردها

**Êdî** rabe herinê (di rabe henê).

دیگه بلند شو بریم

Ez li **ba** te me.

من در کنار تو هستم (با تو هستم).

Ew **belkê** bêbe wir.

ایشان شاید که بیاید به آنجا

Ew li **bal** min bû.

ایشان در کنار من بود.

Rojîn **bes** tu were.

روژین خانم فقط شما بیاید.

**bese** bix we.  
**cem** wê ye.  
**dîsa** hat.  
 li **gel** min e.  
 li **gor** wan.  
**heta** êvarê.  
**heya** sibehê.  
**loma** nêye.  
**lewma** xwar.  
**mîna** şêran.  
**nêzîk** te.  
**xa** (jixwe) nêye.  
**tenê** tu were.  
 تنها تو بیا.

**wekî** mêran.  
 مثل مرد (کنایه از رشادت).

**weha** nabe.  
 اینجوری نمی شود.

**wilo** dibe.  
 اینجوری ممکن است

**wisa** rind nine.  
 اینجوری خوب نیست.

**xwast** bike.  
 خواست انجام دهد.

**Dîsa** li Qoçanê baran dibare.  
 دوباره در قوچان باران می بارد

**Ger** em azad bibin hînga em ê **mîna** ademan bijîn (zindigî biken).  
 اگر ما آزاد بشویم آنگاه ما مثل آدم زندگی خواهیم کرد.

**Heta** ku ew nêbe, ez naçim (narim).  
 تا که او نیاید، من نمی روم.

**Wekî** (wek ku) te got, va kara cûr nabê.  
 همانطور که تو گفتی، این کار جور نمی شود.

**Hetani** êvarê em li wir man.  
 تا عصر ما در آنجا ماندیم.

Sal **mîna** bawîşkan tîn û terin.  
 سال ها مثل خمیازه کشیدن (دهان دره) می آیند و می روند.

همانطور که در لابلای مثالهای درسهای قبلی نیز مشاهده کردید در کُرمَنجی چهار حرف اضافه هستند که گاهاً بصورت اختصاری و ادغام شده با ضمایر بعد از آنان نوشته می شوند و یا بعبارت دیگر بصورت فشرده و مخفف بکار می روند تا از نوشتن مجدد آن ضمایر (مفرد، جمع) که موقعیت کاری آنان قبلاً در جمله معلوم می باشد، جلوگیری شود. به مثالهای صفحه بعد توجه کنید:

**Jê ... , tê ... , pê ... , lê**

**Lê = li + wê / wî**

**jê = ji + wê / wî**

**pê = bi + wê / wî**

**Tê = di + wê / wî**

Kesên ku şagirdê wî bûn **pê** (bi wî) va kar dikirin.

کسانی که شاگردان ایشان بودند با ایشان کار می کردند.

Hûn çere û kînga **pê** hesfyan.

شما کی و چگونه مطلع آن شدید؟

Hûn çima **pê** dikenin.

شما چرا به او می خندید؟

Em bi rastî **pê** kêfxweş bûn.

براستی ما با آن شادمان شدیم

Ew gişt (kulî) **tê** hilhatin.

همه آنها در آنجا (مکان) جور شدند (جای گرفتن)

Menteqa qoriqirîye tendorê li bakûra Qoçanê ye û **tê** da pezkovî hene.

منطقه حفاظت شده تندوره در شمال قوچان است و در آنجا گوسفند وحشی شکاری هست.

Mêrikê Hotilê otaqa min û nivînên ku ez **tê** (di wan) da rakevim bi min nîşan dan.

آقای مستخدم هتل، اتاق و رختخوابی که در آن بخوابم را به من نشان داد.

Mizgînekê ji bavî min bistînin saku **jê** (ji wî) ra nevîyek çêbûye.

یک هدیه از پدرم بگیریید برای این خبر خوش که ایشان نوه دار شدند.

Dixtor **lê** (li wê) temaşe kir û got ku ew sax e (salim e / xweş e).

دکتر (پزشک) به ایشان تماشا کرد و گفت که ایشان سالم است.

Min gepa wî **lê** (li wî) wegerand.

من حرف ایشان را بهش (به او) برگرداندم

ذیلاً حالتها و معانی مختلف این چهارکلمه ادغام شده را در کُرمَنجی باهم مرور می کنیم.

## Tê

1) **Tê** = di + wî / wê (vî / vê)

2) **Tê** = tu + ê

**tê** bixwezî, ew ê bide te.

شما بخوایید، ایشان به شما خواهد داد

3) **Tê** آینده

meha **tê** ماه آینده

4) **Tê** پیشوند افعال مرکب

این پیشوند در جلوی کلمات یا افعال می آید و معنی؛ بودن، دانستن، آمدن و ارزش دادن را به کلمات می دهد.

**Tê**gihiştin, **tê**dan, **tê**ketin.

## Lê

1) **Lê** = li + wî / wê (vî / vê) [( li kesekî / li tiştêkî

ew **lê** (li dîya xwe) çûye.

ایشان به او (به مادرش) رفته است.

sêri **lê** (li wê) digerîne.

سرش (سر او) را مشغول می کند.

Beran **lê** (li mîyê) ket.

قوچ با میش جفت گیری کرد (پرید روی میش)

Bavo **lê** (li wî) nifir kir.

پدر بهش (به او) نفرین کرد.

Deynî (dêhnî) wî **lê** (li wî) vegeerîne.

دین / قرض او را بهش (به او) برگردانید.

Min barê xwe **lê** (li kerê) kir.

من بار خود را رویش (روی الاغ) بار کردم.



2) **Lê** اما، از طرف دیگر

Rovîyan dine xirab kirîye **lê** navê guran derketîye.

روباه ها دنیا را خراب کرده اند اما اسم گرگها در آمده.

Tav herdê dixemilîne **lê** karkirin adem (mirov).

آفتاب زمین را تزیین می کند (آراستن) اما کارکردن انسان را.

3) **Lê** سیل

Baran barî û **lê** ket bin xanîye me.

باران بارید و سیل به زیرخانه ما افتاد.

حرف ندا: برای صدا کردن مونث (برای صدا کردن مذکر از Lo استفاده می شود)

4) **Lê** آهای - خانم

**Lê** Rojîne.

آهای خانم روزین.

**Lo** آهای- آقا

**Lo** lawiko.

آهای آقا پسر.

**Lêlê** tu kuda terî.

آهای سرکار خانم شما کجا می روید؟

**Lo** Reşo.

آهای جناب رشو (رشید).

(همچنین خلاصه کردن اسم در کردی نشان از صمیمیت و رفاقت

نیز است که در زبان محاوره ای در بین مردم عادی معمول است).

**Lolo** meke barebar (qareqar).

آهای (مرد) هارت و پورت (جنجال و المشنگه) نکن.

**Xelko** ez çî bikem.

برای حرف ندا در حالت جمع، از کلمه Xelko (gelo) نیز استفاده می شود.

دیگر حروف ندا شامل:

**ax, ox, ay, êh, ah, hah, of, tûf, wax, way, heray, elepîs, er, ...**

5) **Lê** پیشوند افعال مرکب

**Lêgerîn** گردآوری کردن  
**lêkolîn** (kolandin) پژوهش کردن، تحقیق کردن  
**Lêxistin** زدن، نواختن  
**Lêkirin** پوشاندن، آباد کردن

**Jê**1) **jê** = ji + wî / wê (vî / vê) حرف اضافه

Heke te Rojin dit **jê** ra mebêje (mewêje).  
 اگر شما روژین را دیدید برای او نگوئید.

2) **jê** پیشوند افعال مرکب

**Jêkirin** کندن

sêv ji darê **jêkirin**.  
 سیبها را از درخت کندن.

**jêçûn** از دست دادن  
 çiqes **jêçû** ye.

**Pê**1) **pê** = bi + wî / wê (vî / vê) حرف اضافه

**Pê** hesîyan.  
 از او باخبر شدن.

**Pê** nikarim reqîb bibim.  
 با او نمی توانم رقیب شوم.

**Pê** kenîn.  
 به او خندیدن.

**Pê** nikarim bilîzim.  
 با او نمی توانم بازی کنم.

**Pê** xweş bûn.  
 با او خوش بودن.

2) پا - پای **pê**

**pê** lê kirin.  
پا روی آن گذاشتن.

ji **pê** kirin.  
از پای در آوردن.

Rabûn ser **pê** (piyan).  
سر پا بلندشدن.

Rakirin ser **pê** (piyan).  
سر پا بلندکردن.

Mî (mih) **pê** li berxa xwe nake.  
میش پا روی بره اش نمی گذارد.

3) از پشت - به دنبال **pê**

Ketin **pê** (pey) min.  
به دنبال من راه افتادن.

Dan **pê** (pey) hev.  
به دنبال هم کردن.

Sibeh tê, xêr jî ji **pê** ra tê.  
صبح می دمد، خیر و برکت هم به دنبالتش می آید.

4) پیشوند افعال مرکب **pê**

**Pêçandin** پیچیدن

**Pêketin** گرفتن (آتش)

**pêxistin** (vêxistin) روشن کردن (آتش)

## درس پنجم

### اسم و حروف ندا در کُرمانجی

Nav û bêjeyên bangî li Kurmancî

## صرف کردن

## Tawdan

Tewandin یا بعبارت دیگر کج کردن (کنایه کردن و خم کردن کلمات) در واقع همان تغییر دادن، تاب دادن و یا چلانیدن کلمات است. در کُرمَانجی، این تغییر ممکن است به کمک پسوندها، و یا با جایگزینی بعضی از حروف کلمه و یا با جایگزینی کلمه انجام شود.

در ادبیات فارسی و عربی برای این تغییر از واژه "صرف و نحو" استفاده می شود، در ادبیات کُرمَانجی از واژه " Tawdan / Tewandin " و یا " Xwar kirin " استفاده می شود. برای تغییر افعال گاه از واژه Kişandin استفاده می شود، از حالتی به حالت دیگر کشاندن و تغییر دادن.

زبانهای تصریفی دارای ادبیات صرف و نحوی هستند، بدین معنی که در آن افعال دارای ریشه بوده و متغیر می شوند. مثل زبانهای کوردی، فارسی، عبری، عربی، هندی، یونانی، لاتینی، فرانسوی، انگلیسی، آلمانی و دیگر زبانهای اروپایی .

زبان کوردی یک زبان تصریفی است، یعنی اینکه کلمات و واژه های آن در هنگام صحبت کردن مثل خود نمی مانند بلکه بسته به جایگاه آنان در جمله و وظیفه ای که به خود می گیرند، تغییر، تصریف و از حالتی به حالت دیگر تاب و کج می شوند تا شکل مناسب، همگون و سلیس خود را جهت پیوندی مناسب (هم آویزی مساعد) با کلمات دیگر بوجود آورند که غایت نهایی آن همانا تولید محاوره ای روان، نرم، خوش آهنگ و همبسته می باشد.

Tewandin یا بعبارت دیگر کج کردن (کنایه کردن و خم کردن کلمات) همان تاب دادن و یا چلانیدن کلمات است. با این تغییر، کلمات از حالت موجدار و پستی بلندی در جمله بدرآمده، و حالت ناهمواری خشن خود را به خمیدگی نرم، روان و کادوبندی همبسته و هم آهنگ می دهند که نهایتاً آماده آرایه جهت بیانی نرم، شیوا و واضح می شوند. وقتی که کلمه از حالتی به حالت و یا اشکال دیگر برگردانیده شود در معنی و مقصود آن تعبیر و تغییر حاصل نمی شود.

در کُرمَانجی، کنایه کردن و تغییر دادن تلویحی کلمات (بدون تغییر در معنی کلمات) ممکن است به کمک اضافات و پسوندها، و یا ممکن است بعضی از حروف کلمه با حرفهای دیگری جایگزین شود، و یا ممکن است با کلمه تغییر یافته جداگانه ای (مثل ضمائر شخصی کنایه) انجام شود.

همانطور که در فارسی، وند، پسوند و پیشوند وجود دارد (به انگلیسی: affix, prefix, suffix) ، در کُرمَانجی به آن pirtik, pêşpirtik, paşpirtik می گویند. Pirtik در واقع همان وصله (تکه پارچه و یا تکه کهنه کوچک) است که به لباس می دوزند یا وصل می کنند.

درمثالهای ذیل پسوندهای ملکی با رنگ **قرمز** و پسوندهای کنایه با رنگ **آبی** نشان داده شده اند.

Mesrefa çûyinê ji ya hatinê hêsantir bû

مصرف رفتن نسبت به آمدن آسانتر بود.

bilûrên şivanan

نی های چوپانان

kirasê keçikê

پیراهن آن دختر

ker a kelegîyekî

الاغ یک روستایی

در جمله اول کلمات **hatin** و **çûyin** (çûn) مصدر هستند و **ê** همان پسوند کنایه و یا **paşpitika** **tewandin** است. در درسهای آینده در مبحث صرف کردن فعل خواهیم دید که در گرمانجی قسمت مصدر فعل نیز همانند اسم تغییر و تصریف می شود.

بهر حال ذیلاً با آوردن مثالهای گوناگون، توضیحات فوق الذکر به تفکیک شفاف و زلال خواهند شد، و در لابلای این مثالها متوجه خواهیم شد که برای این تغییرات و کنایه کردن ها، کلمات چه موقع پسوند می گیرند، چه موقع با تغییر حروف کلمات، شکل آن تغییر می یابد و یا چه موقع کلمهء جداگانهء جدیدی بکار می رود.

کلمات قابل تغییر دادن، کج کردن و یا کنایه کردن در گرمانجی که در این جلسه و جلسات آینده مورد بحث قرار می گیرند، از قرار ذیل می باشند:

- 1 - اسم
- 2 - ضمائر
- 3 - اعداد و ارقام
- 4 - فعل

در گرمانجی واژه هایی که ثابت هستند (تغییر و یا کج و کنایه نمی شود) از قرار ذیل می باشند:

- الف - صفت (مثل: **gewr, rind, bilindtir, mezin, qeşeng** ...)
- ب - قید (مثل: **îro, hînga, nêzik, bes, kê m, kînga, nika, paşî, berî** ...)
- ج - حروف اضافه (مثل: **di, li, ji, di - da, ji - ra** ...)
- د - حروف ربطی (مثل: **wek, û, yanku, lê, ku** ...)
- و - حروف ندا (مثل: **Lê, Lo, ax, way, ox, tûf, hey, wax** ...)

**1 - اسم ( کج کردن، کنایه کردن یا خم کردن ) Nav (Tewandin, xwar kirin, tawdan**

اسم با توجه به موقعیت و وضعیت آن در جمله تغییر، خمیده و یا کج می شود. زبان کردی، یک زبان جنسیتی است، یعنی اینکه کلیه موجودات هستی (چه جاندار و چه بی جان) یا مذکر و یا مونث هستند، و بر اساس نوع جنسیت آنان، پسوندهای خاص خود را می گیرند. اسامی که بصورت عام و یا خنثی (نوترال) باشند، موقعی که آن اسم (شخص، شی) از حالت عام بدرآید و فرم مشخص و ناخته شده ای بخود بگیرد، حالت جنسیتی آن با نوع بیان و پسوندها و اضافات در جمله، بوضوح قابل رویت و درک است (مثلاً اسامی عام: دوست، معلم و ... موقعیکه شناخته شوند جنسیت آنان قابل درک است).

در کُرمَانجی بطور کلی اسم و ضمیر موقعیکه در حالت های زیر باشند، کج می شوند و یا تغییر می یابند

- الف - در حالت فاعلی (فعل متعدی در زمان گذشته)
- ب - در حالت مفعولی (فعل متعدی در زمان حال و آینده)
- ج - در حالت مفعولی (بعد از حروف اضافه)
- د - در حالت ملکی
- و - در حالت حرف ندا (بعد از حروف ندا)

**الف - اسم در حالت فاعلی (فعل جمله: فعل متعدی در زمان گذشته)**

هنگامی که اسم بعنوان فاعل جمله ای که دارای مفعول است، باشد (در زمان گذشته)، آن اسم کج (خمیده و یا کنایه) می شود. در مثالهای زیر رنگ قرمز پسوند tewandin است که به اسم اضافه شده و آن را کنایه (xwar kirin) کرده است. اسامی مونث با گرفتن پسوند ê و اسامی مذکر با گرفتن پسوند î و اسامی جمع (چه مذکر و چه مونث) با پسوند an تغییر و کج یا خمیده می شوند. مثال:

**Navên mê** اسامی مونث

Keçê (keçikê) kiras kirî  
آن دختر پیراهن را خرید.

Delalê kiras kirî  
خانم دلال پیراهن را خرید.

Mangê ka xwar  
ماده گاو گاه را خورد.

Keçê (keçikê) nan pijand (pat)  
آن دختر نان را پخت.

Rojînê gul av dan  
خانم روزین گلها را آب داد.

Keçekê ew dît  
یک دختر او را دید.

Lêylayê ew da min  
خانم لیلا آن را به من داد.

Mirîşkê av vexwar  
مرغ آب را نوشید.

Bizinê ceh xwar  
بز جو را خورد.

Lêylayê sêv xwar  
خانم لیلا سیب را خورد.

Berfînê name xwend  
خانم برفین نامه را خواند.

Perwînê kitab xwend  
خانم پروین کتاب را خواند.

Rojînê ji min ra xelatek kirî  
خانم روژین برای من یک هدیه خرید.

Ez mehîne dibînim  
من مادیان را می بینم.

### Navên nêr اسامی مذکر

Karmendekî tilifon kir  
یک کارمند (مذکر) تلفن کرد.

Lawikek(î) / Lîwik keç xelat kir  
یک پسر به آن دختر هدیه داد.

Xortekî (lawikekî) ew dît  
یک پسر جوان او را دید.

Efrasîyabî (Efrasîyêb) kitab xwend  
آقای افراسیاب کتاب را خواند.

Ferhadî (ferhêd) name nivîsî  
آقای فرهاد نامه را نوشت.

Danîyalî (Danîyêl) qelemek da min  
آقا دانیال یک قلم به من داد.

Nasirî (Nêsir) kitaba min xwend  
آقا ناصر کتاب من را خواند.

Nasirî (Nêsir) kitab xwend  
آقا ناصر کتاب را خواند.

Wî kurî (lawikî) agir bi dilê wê xist  
آن پسر آتش به دل او زد.

Vî lawikî kiras kirî  
این پسر پیراهن را خرید.

Wî xortî berx av dan  
آن پسر جوان بره ها را آب داد.

Ez hespî (hêsp) dibînim  
من اسب را می بینم.



Navên pirhêjmar **اسامی جمع**

Şorişgeran hêsîrek kuşt  
شورشگران یک اسپر را کشتند.

Kelegînan genim çand  
تعدادی از روستایی ها گندم کاشتند.

Kelegîyan genim çand  
روستاییان گندم کاشتند.

Şagirdan alîkarîya me kir  
شاگردها به ما کمک کردند.

Palevanan nîsk çinîn  
دروگرها عدس را درو کردند.

Çûçikan tût xwarin  
گنجشکها توت ها را خوردند.

Şorişgerinan hêsîrek kuşt  
بعضی از شورشگرها یک اسپر را کشتند.

Bizinan ceh xwar  
بزها جو را خوردند.

هنگامی که اسم یا فاعل دارای مفعول نباشد، آن اسم تغییر و کنایه نمی شود (در مثالهای زیر جمع بودن اسم/فاعل که بصورت عام می باشند از جمع بودن فعل که علامت n دارند، مشخص می شود).  
مثال:

Cotkar hatin  
شخم کارها آمدند.

Doşmen ê bimirin  
دشمنان خواهد مرد.

Şagird rabûn  
شاگردها بلند شدند.

Hesp hat  
Hesp hatin  
Mehîn (mahîn) hat  
Mehîn (mayn) hatin

Rêwî dihênijîn  
رهگذرها چرت می زدند.

هنگامی که اسم، فاعلی که در ارتباط با مفعول باشد را درست کند، آن اسم در زمان حال و آینده تغییر نمی یابد. مثال :

Mêr tifangan amade dikin  
مردها تفنگها را آماده می کنند.

Koçer ê biçin (herin) zozanan  
کوچروها به مراتع خواهند رفت.

Jin şorişgeran bi rê diken  
زنها شورشگران را راهی می کنند.

Xort ê biçin (herin) çîyan  
پسرها به کوهها خواهند رفت.

Keç xortan dibînin  
دخترها پسران را می بینند.

Serbaz ê doşmen bikujin  
سربازها دشمن را خواهند کشت.

## ب - اسم درحالت مفعولی (فعل جمله:فعل متعدی در زمان حال و آینده)

موقعیکه اسم ویا ضمیردرجمله درحالت مفعولی قرار بگیرد،کج می شود( تغییر می یابد). اسامی که مونث باشند با گرفتن پسوند **ê** و اسامی مذکر با گرفتن پسوند **î** و اسامی جمع با گرفتن پسوند **an** ، کج و یا خمیده می شوند. مثال :

## زمان حال

Ez şivan <b>an</b> dibînim من چوپانها را می بینم.	Dara otomobîl <b>ê</b> dajo آقای دارا ماشین سواری می کند.
Ez hesp û mehî <b>nê</b> dibînim من اسب و مادیان را می بینم.	Lale nan <b>î</b> (nîn) dixwe خانم لاله نان (غذا) می خورد.
Ez hesp û mehî <b>an</b> dibînim من اسب و مادیانها را می بینم.	Ez namey <b>ê</b> (namê) dinivîsim من نامه را می نویسیم.
Ez mîy <b>ê</b> û bizin <b>an</b> dibînim من میش و بزها را می بینم.	Ez hespek <b>î</b> dibînim من یک اسب را می بینم.
Em gul <b>an</b> diçinin ما گلها را می چینیم	Ez hesp <b>an</b> dibînim من اسبها را می بینم.
Xort keç <b>an</b> xelat diken پسرها به دختران هدیه می دهند	Lale sêv <b>ê</b> dixwe خانم لاله سیب می خورد.
Rojîn bizin <b>ê</b> didoş خانم روزین بز را می دوشد.	Lale sêv <b>an</b> dixwe خانم لاله سیبها را می خورد.
Danîyal tifang <b>ê</b> hildigire آقای دانیال تفنگ را می گیرد.	Lale şeker <b>ê</b> (şêker) dixwe لاله خانم شکر می خورد.
Rojîn nîn (nên) dixwe خانم روزین نان (غذا) می خورد.	Lale şikolatan <b>an</b> dixwe لاله خانم شکلاتها را می خورد.
Rojîn şîv <b>ê</b> çêdike خانم روزین شام درست می کند.	Lale diçe debistan <b>ê</b> لاله خانم به مدرسه می رود.
Rojîn wî gîyay <b>î</b> dikelîne خانم روزین آن گیاه را می جوشاند.	Mamoste ders <b>ê</b> dide آقا معلم درس می دهد.

Mamosta dersê dide

خانم معلم درس می دهد.

Ez hespî (hêsp) û mehînan dibînim

من اسب و مادیانها را می بینم.

Danîyal kum (kumî) dide serî xwe

دانیال کلاه به سر خود می گذارد.

Lale desmalê dide serê xwe

لاله خانم دستمال را روی سرش می گذارد.

Danîyal rojnameyê (rojnamê) dixwîne

دانیال روزنامه می خواند.

Danîyal rojnameyan (rojnaman) dixwîne

دانیال روزنامه ها را می خواند.

Min qelemek da Danîyalî (Danîyêl)

من یک قلم به دانیال دادم.

Min reqema tilifona xwe da Zînê

من شماره تلفن خود را به زینت دادم.

Lale duçerxê diajo (dajo / tajo)

لاله خانم دوچرخه سواری می کند.

Dîlber du kitabên bi hev ra dixwîne

خانم دلبر دو تا کتاب را با همدیگر می خواند.

Dara nameyê (namê) dinivîse

آقای دارا نامه را می نویسد.

Nasir kitabê dixwîne

ناصر کتاب می خواند.

Lale nîn (nanî) çêdike

خانم لاله نان (غذا) درست می کند.

Koçer li biharê diçin (terin) zozanan  
کوچروها در هنگام بهار به مراتع (کوهدشت ها) می روند.

Ew Zelalê dibin kuderê  
آنها خانم زلال را به کجا می برند؟

Em ê kitabekê bikirin  
ما یک کتاب خواهیم خرید.

Lale Kevçîyekî dişo  
لاله خانم یک فاشق را می شوید.

Ez beranî kur difiroşim  
من قوچ گوش کوتوله را می فروشم.

## زمان آینده

Ez ê şivanan bibînim  
من چوپانها را خواهم دید.

Em ê gulan biçinin  
ما گلها را خواهیم چید.

Ez ê keçê bibînim  
من دختر را خواهم دید.

Ez ê lîwik (lawikî) bibînim  
من پسر را خواهم دید.

Lale ê (yê) sêvan bixwe  
خانم لاله سیبها را خواهد خورد.

Danîyal ê mangê bibe olengê  
آقای دانیال ماده گاو را به سبزه زار (مرغزار) خواهد برد.

Ew ê (wê) şehran bixemilînin  
آنها شهرها را آذین بندی (چراغانی) خواهند کرد.

Lale ê (yê) sêvê bixwe  
خانم لاله سیب را خواهد خورد.

Ez ê bêjeyan ducar binivîsim  
من واژه ها را دو بار خواهم نوشت.

Em ê dawetê bixemilînin  
ما عروسی را تزئین خواهیم کرد.

Hûn ê yêkê bi tenê bînin  
شما یکی تنها را بیاورید.

## زمان گذشته

در زمان گذشته، اسامی که در حالت مفعول باشند بدون تغییر می مانند (اما در زمان حال و آینده آن اسم تغییر، کج و یا کنایه می شود). مثال:

Kelegîyan gur kuştin  
روستاییان گرگ را کشتند.

Min lawik dît  
من پسر را دیدم.

Şivanan pez dîtin  
چوپانها گوسفند را دیدند.

Zînê ez dîtim  
Zînê rojîn dît

Min karger dîtin  
من کارگرها را دیدم.

Hespan ceh xwar  
Mangan gîya xwaribû  
Xizîn pencere şikand

Min keçik dît  
من دختر را دیدم.

اسامی مذکر که در آنها حرف **e** یا حرف **a** وجود داشته باشند و قتی که در موقعیت تغییر (کج شدن و خمیده شدن) قرار بگیرند، حروف مذکور به **ê** تبدیل می شوند. مثال:

Ez çûbûm çîyê (çê) Çîya > Çîyê  
من به کوه رفته بودم.

Ez ber bi çîyayî (çîyê) Gulîlê terim (diherim) Çîyayê > çîyê  
من به طرف کوه گللی می روم.

Çîyayê (çîyê) bilind hemîşe li ser dûman heye  
کوه بلند همیشه مه آلود است.

Ez ji çîyê şahîcanê (şadîcanê) pir hez dikem  
من از کوه شاهی جان (شادی جان) لذت می برم.

Dinê li dinê, çavê gur li bizinê Dinya > Dinyê > Dinê  
دنیا سر جایش است، اما چشم آقا گرگه به بز است.

Rojîn çirayê (çirê) xeva dike Çira > Çirayê > çirê  
خانم روزین چراغ را خاموش می کند.

Rojîn perdeyê (perdê) radike Perde > Perdeyê > perdê  
خانم روزین پرده را بلند می کند.

Heval > Hevêl

Min ji hevêl ra got

من به دوست گفتم.

Min ji ava rûbêr (çêr) vexwar      Rûbar (çem) > rûbêr (çêr)

من از آب رودخانه نوشیدم.

Gê ka xwar      Ga > Gê

گاو کاه را خورد.

Êş genim ard kir      Aş > Êş

آسیاب گندم را آرد کرد.

Ez ji şêhr têm      Şehr > Şêhr

من از شهر می آیم.

Ez kêvir tavêjim (diavêjim / davêjim)      Kevir > kêvir

من سنگ را پرتاب می کنم.

Kî li ser xênî ye      Xanî > xênî

کی در روی خانه است؟

Firoke bi asmên ket      Asman > asmên

هواپیما به آسمان افتاد.

Ez ê hêsp bikirim

من آن اسب را خواهم خرید.

Berên ceh xwar

قوچ جو را خورد.

Rojîn ji berên ditirse

خانم روزین از قوچ می ترسد.

(گاوچران) Gavan > gavên  
 (چوپان) Şivan > şivên  
 (جنگجو) Şervan > şervên  
 (کار) Kar > kêr  
 (فعالیت) Xebat > xebêt

Ez çûm aş > Ez çûm êş  
 من به آسیاب رفتم.

Werin fetîr bixwan > Werin fêtîr bixwan  
 بیا بید فتیر (نان قندی) بخورید.

Ba lêxist > Bê lêxist  
 باد به آن زد.

Nasir > Nêsir

Efrasîyab > Efrasîyêb

Danîyal > Danîyêl

Ferhad > Ferhêd

## اسم معلوم و مجهول

## اسم معلوم:

اسمی که برای شنوده یا خواننده آشنا باشد در معرفه (معلوم) می‌گویند. مثلاً در جمله «مداد را به علی دادم» «مداد» و «علی» معرفه هستند، چون خواننده «علی» را می‌شناسد و می‌داند که از کدام «مداد» صحبت می‌شود.

## اسم مجهول:

اگر اسمی برای خواننده یا شنوده آشنا نباشد، به آن اسم نکره (مجهول) می‌گویند. مانند جمله «دوستی را دیدم» که در آن خواننده نمی‌داند که آن دوست چه کسی است.

در کُرمانجی دو پسوند **in** , **ek (yek)** برای اسم مجهول (حالت مفرد و جمع)، و سه پسوند **ê**, **a**, **ên** برای اسم معلوم (حالت مفرد مذکر و مونث، و جمع) بکار می‌روند (این پسوندها را گاه‌ها حروف تعریف می‌نامند). اگر اسم مذکر و معلوم باشد، در بسیاری از مناطق کُرمانج نشین پسوند **î** استفاده نمی‌کنند (یعنی آن را تغییر نمی‌دهند و بدون کج کردن رهامی کنند)، در بسیاری از مناطق کُرمانج نشین بجای اضافه کردن **î** در واقع با پسوند **ê** آن اسم را کج می‌کنند. ما گردهای خراسان اغلب از پسوند **î** استفاده می‌کنیم، البته از **ê** هم استفاده می‌کنیم.

**ek** > Hesp**ek**, mehî**nek**, kew**ek**, jine**ek**, mamostey**ek**, stû**nek**

**in** > Hesp**in**, mehî**in**, şivan**in**, jin**in**

**ê** > Hespî min (hesp**ê** min) , çîyayî bilind (çîyay**ê** bilind)

, pismamî min (pismam**ê** min)

**a** > Mehî**a** min, newala kûr, dotmama min, jina delal

, stû**a** qalind, destmala rojî**nê**, kewa**a** mê

**ên** > Hesp**ên** me, çîyay**ên** bilind, pismam**ên** me, kew**ên** nêr

, mehî**ên** me, newal**ên** kûr, dotmam**ên** min, jin**ên** delal

, stû**ên** qalind, destmal**ên** rojî**nê**, kew**ên** mê

کنایه کردن یا کج کردن اسامی مذکر (معلوم و مجهول) - Lawik

حالت	اسم مفرد، معلوم	اسم مفرد، مجهول	اسم جمع، معلوم	اسم جمع، مجهول
ساده	Lawik	Lawik	Lawik	Lawik
کنایه	Lawik(î) /îwik	Lawikekî	Lawikan	Lawikin
حرف ندا	Lawiko	.....	Lawikno	.....



## کنایه کردن یا کج کردن اسامی مذکر (معلوم و مجهول) - Xort

حالت	اسم مفرد، معلوم	اسم مفرد، مجهول	اسم جمع، معلوم	اسم جمع، مجهول
ساده	Xort	Xortek	Xortin	Xortin
کنایه	Xort(î)	Xortekî	Xortinan	Xortinan
حرف ندا	Xorto	.....	Xortno	.....

## کنایه کردن یا کج کردن اسامی مذکر (معلوم و مجهول) - nan

حالت	اسم مفرد، معلوم	اسم مفرد، مجهول	اسم جمع، معلوم	اسم جمع، مجهول
ساده	Nan	Nanek	Nan	Nanin
کنایه	nîn / nêñ/ nanî	Nanekî	Nanan	Naninan
حرف ندا	Nano	.....	Nanino	.....

**نکته:** در مثالهای زیر اسامی مجهول، پسوند **ek** - و یا **yek** - دارند. اگر اسم معلوم باشد، در بسیاری از مناطق گُرمَانج نشین پسوند **î** استفاده نمی کنند (یعنی آن را تغییر نمی دهند و بدون کج کردن رهامی کنند)، در بسیاری از مناطق گُرمَانج نشین بجای اضافه کردن **î** در واقع حرف **a** و یا **e** آن اسم را به **ê** بدل کرده و بدینوسیله آن اسم را کج می کنند (این مبحث قبلاً در بالا مفصلاً توضیح داده شده است). اما اگر در اسم حرف **a** و یا **e** وجود نداشته باشد آنگاه آن را تغییر نمی دهند و بدون کج کردن مثل خود رها می کنند (اما در مورد مونث، چون اسامی مونث بدون کج کردن مثل خود رها نمی شوند لذا با گرفتن پسوند **ê** خمیده می شوند)

Li baxekî hat dîtin

در یک باغ پیدا شد .

Di destekî da sêvek hebû

در یک دست سیبی بود.

Em çûn şehrekî

ما به یک شهر رفتیم.

Ez dikarim nanekî bixwim

من می توانم نانی (غذایی) بخورم.

kanîya gund &lt; kanîya gund(î)

چشمه آب روستا

Werin şêhr &lt; Werin şehri(î)

به شهر بیایید.

kurê Elî(yî) &gt; kurê Elî

پسرک جوان علی

Ba(yî) lêxist &gt; Bê lêxist

باد به آن زد.

Ez çûm êş &lt; Ez çûm aş(î)

من به آسیاب رفتم.

Bide Kawe(yî) &gt; Bide Kawê (wan jî Bide Kawe)

به کاهه بدهید.

کنایه کردن یا کج کردن اسامی مونث (معلوم و مجهول) - keç-

حالت	اسم مفرد، معلوم	اسم مفرد، مجهول	اسم جمع، معلوم	اسم جمع، مجهول
ساده	Keç	Keçek	Keçin	
کنایه	Keçê	Keçekê	Keçinan	
حرف ندا	Keçê	.....	Keçino	.....

Min ji keçê ra got  
من به آن دختر گفتم.

Mîzekê amade bike  
یک میز را آماده کنید.

Keçekê nan pat  
یک دختر نان را پخت.

Coyekê (Cokê) bikole  
یک جوب را بکنید.

Ew keçan dibînin  
آنها دختران را می بینند.

Bizinê bidoşin  
بز را بدوشید.

Ew keçekê dibînin  
آنها یک دختر را می بینند.

Em ê herin malê  
ما به منزل خواهیم رفت.

Dilê fireh pîr nabe  
دل بزرگ و گشاده روی پیر نمی شود.

Qelemekê bide min  
یک قلم به من بدهید.

Ez mehînekê (maynekê) dibînim  
من یک مادیان را می بینم.

Em çûn dûkanekê  
ما به یک مغازه رفتیم.

Ez mayninan dibînim  
من تعدادی مادیان را می بینم.

Kursîyekê (Kursîkê) bikire  
یک صندلی بخرید.

Çirayekê (çirakê / çirêkê) xeva bike  
یک چراغ را خاموش کنید.

Xwesûyekê (Xwesûkê) zavê xwe xelat kir  
یک مادر زن هدیه ای به داماد خود داد.

Derdê dilan hûr e, kûr e û dûr e  
درد دلها خرده خرده اند، عمیق اند، دور و دراز اند.

Qijik pê nîr didize, jûjî maran dikuje  
کلاغ (سیاه و سفید) پنیر می دزدد، جوجه تیغی مارها را می کشد.

(منطقه بهتان در شمال کردستان)	Bot > Botan
(شهری در منطقه بهتان، و شمال خراسان)	Qoç > Qoçan
(شهری در منطقه بهتان، و شمال خراسان)	Şêr > Şêrwan
(منطقه سوران و رواندوز در جنوب کردستان)	Sor > Soran

اسامی درحالت جمع از هردو جنسیت (چه مذکروچه مونث) با پسوند **an** تصریف می شوند.

Keç**an** kiras hilgirtin  
دختران پیراهن ها را گرفتند.

Qeleman tûj bikin  
قلم ها را سر کنید (تیز کنید)

Serbaz**an** doşmen hêjand  
سربازها دشمن را لرزاندند.

Li mal**an** digerîyan  
در منازل می گشتند.

Pelên dar**an** li Payîzê dirijin  
برگهای درختان در پاییز می ریزند.

Kel**an** gazkêşî tune  
روستاها گازکشی ندارند.

Dengê bizin**an** tê bîstin  
صدای بزها شنیده می شود.

### ج - اسم درحالت مفعولی (بعد ازحروف اضافه)

هنگامی که اسم و یا ضمیر بعد از یک حرف اضافه بیاید، عبارت دیگر اسم درجمله بعنوان مفعول بعد ازحروف اضافه باشد آن اسم تغییر و یا کج می شود (در همهء زمانها).

درمثالهای زیر رنگ **قرمز** پسوند کنایه و رنگ **سبز** حرف اضافه است.

### (paşpirtika tawdanê)

### زمان گذشته

Koçer ber **bi** çîyayan (çîyan) bi rê ketibûn  
کوچروها بطرف کوهها براه افتاده بودند.

Dara **bi** Evînê **ra** çû debistanê  
آقای دارا همراه با خانم ئوین به دبستان رفت.

Min **ji** şagirdan pirsî  
من از شاگردها پرسیدم.

Min **li** kelegîyan selam kir  
من به روستاییان سلام کردم.

Min **bi** şivanan **ra** nan xwar  
من به همراه چوپانان غذا خوردم

Min **ji** keçê **ra** got  
من به آن دختر گفتم.

Te **ji** xort(î) pirsî  
شما از آن پسر سؤال کردید؟

Te **ji** lêwik pirsî  
شما از آن پسر سؤال کردید؟

Wî **ji** rojîne pirsî  
او از روژین خانم پرسید.

Danîyal **ji** êş hat  
آقای دانیال از آسیاب آمد.

Ez **di** malan **da** gerîyam  
من در داخل منازل گشتم.

Ew **di** xanîyekê **da** raketibû  
او در داخل یک خانه خوابیده بود.

Ew **li** malekê rûnişt  
او در یک منزل نشست.

Min **li** wî xist  
من به ایشان زدم.

Min Daniyal **li** Qoçanê dît  
من دانیال را در قوچان دیدم.

Danîyal **ji** rojîne pirsî  
دانیال از روژین سؤال کرد.

## زمان حال

Ez **bi** şivanan **ra** nan (nîn) dixwam  
من همراه با چوپانان غذا می خورم.

Ez ne **bi** duan bûme û ne jî **bi** nifiran dimirim  
من با دوعا متولد نشده ام که با نفرین هم بمیرم.

**Li** nav mêran mêt be, **li** nav şêran şêr be  
در میان مردها مرد باش، در میان شیرها شیر باش.

Evîn **li** mala Cecoxanî ye (Cecoxîn e)  
ئوین در منزل ججوخان است.

Ez **ji** kurmancên Xorasanê me  
من از کرمانجهای خراسان هستم.

Lale **li** kêleka Ferhadî (Ferhêd) rûniştîye  
لاله خانم در کنار فرهاد نشسته است.

Bêrîvan **bi** leylayê **ra** gepdike  
کدبانوی شیردوش با لایلا صحبت می کند.

Lale **ji nav** baxçeyan (baxçan) tê  
لاله خانم از داخل باغچه ها می آید.

Ez **ji** şagirdan dipirsim  
من از شاگردها سؤال می کنم.

Ez **li** kelegîyan selam dikem  
من به روستاییان سلام می کنم.

Çav **ji** çavan fedî nake  
چشم از چشمها حجالت نمی کشد.

Lale **ji** Qoçanê tê  
خانم لاله از قوچان می آید.

Qelem **li ser** mîzê ye  
قلم در روی میز است.

Lale **li** zozanê ye  
لاله خانم در کوهدشت (مرتع) است.

Rojîn **ji** Şîrwanê ye  
روژین از شیروان است.

Lale **bi** xizanan **ra** dilîze  
لاله خانم با بچه ها بازی می کند.

Ewr **di ser me ra** ne  
ابرها روی سر ما هستند.

Ez **bi wan ra** dibêjim  
من به آنها می گویم.

Danîyal **li** rojînê dixê  
دانیال به روژین می زند.

Ez **ji** zimên (zimîn) hez dikem  
من از زبان لذت می برم.

Hirç **li nav** daristanê ye  
خرس در داخل دارستان است.

Bizin **li nav** bexçe ye  
بز در داخل باغچه است.

Lale **ji** Qoçanê ye  
لاله خانم از قوچان است.

Lale **ji** kelê tê  
لاله خانم از روستا می آید.

Lale **li** debistanê ye  
لاله خانم در دبستان است.

Ez **bi** qelemê dinivîsim  
من با قلم می نویسم.

Ez **di** bexçe (baxçeyê) **da** me  
من در داخل باغچه هستم.

**Li wî** temaşe bike  
به او تماشا کنید.

## زمان آینده

Ez ê **ji** şagirdan bipirsim  
من از شاگردها خواهم پرسید.

Ez ê **li** laleyê (lalê) bibim mîvan  
من مهمان لاله خانم خواهم شد.

Ez ê **li** kelegîyan selam bikem  
من به روستاییان سلام خواهم کرد.

Lale ê **li** Tilivîzyonê temaşê bike  
لاله خانم به تلویزیون تماشا خواهد کرد.

Em ê **li** Rojînê bibin mîvan  
ما به روزین خانم مهمان خواهیم شد.

**Ji wê ra** bibêjin  
برای ایشان بگویید.

Ez ê **li** kelegî bibim mîvan  
من مهمان روستایی خواهم شد.

Em ê **li** mazûvanê xwe hurmet dynin  
ما به میزبان خود احترام می گذاریم.

د - اسم درحالت ملکی ( کنایه کردن ضمیر و کج کردن اسم درحالت ملکی )

## Tewandina Nav û Cînavan di rewşa xwedîfî (Milkîyet) da

زمانی که اسم و یا ضمیر مالکیت چیزی را نشان بدهد، تغییر می یابد (بعبارت دیگر موقعیکه کسی یا یک اسمی به نوعی مورد تعریف و یا شناساندن قرار بگیرد، کنایه می شود). ضمائر ساده درحالت مالکیت به ضمائرکنایه تبدیل می شوند، واسامی کج می شوند. بطورکلی درحالت ملکی معمولاً قاعدهء جنسیتی برای کلمات رعایت می شود: اضافهء ملکی برای کلمات مونث و مفرد پسوند **a** - ، و برای کلمات مذکر و مفرد پسوند **ê** - ، و برای کلمات جمع از هر دو جنس پسوند **ên** - است.

{ البته همانطور که در کمی بالاتر بیان شد در کج کردن اسم : پسوند **î** - برای اسامی مذکر، پسوند **ê** برای اسامی مونث، پسوند **an** - برای اسامی جمع از هر دو جنس، بکار می روند. }

برای کلمات مونث		برای کلمات مذکر		برای جمع (هر دو جنس)	
پسوند ملکی	ضمائر شخصی کنایه	پسوند ملکی	ضمائر شخصی کنایه	پسوند ملکی	ضمائر شخصی کنایه
... a (ya	<b>Min</b>	... ê (yê	<b>Min</b>	... ên (yên	<b>Min</b>
... a (ya	<b>Te</b>	... ê (yê	<b>Te</b>	... ên (yên	<b>Te</b>
... a (ya	<b>Wî</b>	... ê (yê	<b>Wî</b>	... ên (yên	<b>Wê</b>
... a (ya	<b>Wê</b>	... ê (yê	<b>Wê</b>	... ên (yên	<b>Wî</b>
... a (ya	<b>Me</b>	... ê (yê	<b>Me</b>	... ên (yên	<b>Me</b>
... a (ya	<b>We</b>	... ê (yê	<b>We</b>	... ên (yên	<b>We</b>
... a (ya	<b>Wan</b>	... ê (yê	<b>Wan</b>	... ên (yên	<b>Wan</b>

مثال:

Bavê wê &gt; yê wê (ê wê)

(حرف ê اگر قبل از اسم یا ضمیر باشد حالت ملکی، اما اگر قبل از فعل باشد نشان زمان آینده است)

Evîna wan &gt; ya wan (a wan)

عشق آنها &lt; مال آنها

Xwenga min &gt; ya min (a min)

خواهر من &lt; مال من

Nivînên me &gt; yên me (ên me)

رخت خواب ما &lt; مال ما

(این کلمات وقتی که ضمائر ملکی هستند از نظر املائی به کلمات دیگر وصل نمی شوند: ya, yê, yên / a, ê, ên)

Nasname &gt; nasnameya (nasnama) me

(در اینجا اسم به یک حرف صدادار ختم شده لذا حرف y در بین اسم و پسوند ملکی قرار می گیرد تا از آمدن دو حرف صدادار پشت سر هم جلوگیری کند.)

در مثالهای زیر رنگ آبی پسوند ملکی و رنگ قرمز پسوند کنایه است .

Tava biharê dikeve danê êvarê

آفتاب بهار به هنگام عصرها می افتد.

Werisê rizî bêkar (bêkêr) e

ریسمان پوسیده نابکار است.

Sola teng lîngan kul dike

کفش تنگ پاها را ورم و عفونت می کند.

Çavên yarê kil naxwazin

چشمهای یار سر مه نمی خواهند.

Porê Berfînê dirêj e

موهای خانم برفین بلند است.

Şaxên daran bi gul in  
شاخه های درختان گل دارند.

Gotinên guhdaran zanîstî bûn  
گفته های شنوندگان علمی بودند.

Gizika jinika kawî pir rind bû  
نوزاد آن زن ایل کاوانلویی خیلی خوب بود.

Bavê min camêr bû  
پدر من مرد شجاعی بود.

Dîya te bêrîvan e  
مادر شما کدبانو شیردوش است.

Kekê min dutarvan e  
برادر بزرگم دوتارزن است.

Birayê wê şivan e  
برادر ایشان چوپان است.

Xwenga min mamosta ye  
خواهر من معلم است.

Apê wî çodar û bilûrvan e  
عموی ایشان چوبدار و نی زن است.

Amojina (moja) min teşîrês e  
زن عموی من دوک ریس (پشم) است.

Pismamê te şofir e  
پسر عموی شما راننده است.

Dotmama min bermalî ye  
دختر عموی من خانه دار است.

Xalê wê gavan e  
دایی ایشان گاوچران است.



Xalojina **min** nexweş e

زن دایی من بیمار است.

Xwarzîyê **wî** şagird e

خواهرزاده ایشان دانش آموز است.

Meta **te** dilovan e

عمهء شما مهربان است.

Xaltîka **min** aşpêz e

خالهء من آشپز است.

Pisxaltîya **te** birîndar e

خاله زادهء شما زخمदार است.

Bapîrê **min** çîrokvan bû

پدر بزرگ من داستان گو بود.

Dapîra **te** pir bêhal e

مادر بزرگ شما خیلی بی حال است.

Xezûrê **te** dara ye

پدر شوهر شما ثروتمند است.

Xwesîya **min** xêrxwaz e

مادر زن من خیرخواه است.

Tîyê **te** cotkar e

برادر شوهر شما شخمکار (زراعتکار) است.

Nevîyê **bavî min** pir in

نوه های پدرم زیاد هستند.

Baldûza **min** tevnvan e

خواهر زن من فرش باف است.

Cawîya **te** pir qeşeng (xweşik) e

خواهر شوهر شما خیلی خوشکل است.

Teşîya zirav (zirêv) barek dirav (drêv)  
دوک باریک پشم ریزی درآمد زاست.

Birazîyê min xwendevan (dersxan) e  
برادرزاده من تحصیلکرده است.

Hembêza dayîka min pir xweş û germ bû  
بغل مادرم خیلی خوش و گرم بود

Mala bavê şêrîn e, mala mêran hêlîn e  
خانه پدر شیرین است، خانه شوهر منزلگاه (لانه) است.

Dara bîyê para mîyê, dara gûzê bextê qêzê  
درخت بید سهم گوسفند است، درخت گردو بخت دختر است.

Hewîya te tozekê terhal / teral (cangiran) e  
زن شوهر (هوو) شما یک ذره (کمی) تنبل / سنگین است

Zimangên Hezameçîtê pir hênik in  
دامنه های پشت به آفتاب کوه هزارمسجد خیلی خنک هستند.

Berojên Petlegahê germ in  
دامنه های رو به آفتاب کوه پتله گاه گرم هستند.

Newala (Zawê) Şemxalê (Şemxêl) bi zinar û pezkovî ye  
دره شمخال (جنوب شهر باجگیران) دارای صخره و گوسفند شکاری است.

Zozana (Textê) gulîlê bi gul û gîya ye  
مرتع (کوهدشت) گولیل با گل و گیاه است.

Kanîya şevxanê li çîyayi Spicîrê ye  
چشمه شبخانه در کوه اسپجیر است.

Dersên kurmancî  
درسهای کرمانجی

Malên koçeran  
منزل کوچروها

Kitabên kurmancî  
کتابهای کرمانجی

Gayê bavê min  
گاو پدر من

Xanîyê xalê min

خانه دایی من

Kerê kelegîyekî

الاغ یک روستایی

Agirê (arê) mala me

آتش منزل ما

Bavê Danîyalî (bavê Danîyêl)

پدر آقای دانیال

Serê birayê wî

سر برادر ایشان

Porê jinekê

موی یک زن

Bizina jinikê

بزآن زن

Lawê Ferengîsê

پسر خانم فرنگیس

Manga me

ماده گاو ما

Pelên darê

برگهای درخت

Dayîka te

مادر شما

Baxçê me

باغچه ما

Navê keçikê

نام آن دختر

Hevalên me

دوستان ما

Kurê bêrîvanê

پسر کدبانو شیردوش

Pişîka min

گربه من

Kulîlkên zozanan

گلهای مراتع

Dîya te

مادر شما

Gulên çîyan

گلهای کوهها

Hespê wan

اسب آنان

Bavê lêwik (lawikî)

پدر آن پسر

Hespên me

اسبهای ما

Bazinê Dilberê

النگوهای خانم دلبر

Debistana wî

دبستان ایشان

Kûçikên şehî (şêhr)

سگهای شهر

Nanê min

نان من

Xalê wê

دایی او

Xalên wî

دایی های او

Welatê me

ولایت ما

Zimanê me

زبان ما

Mala me

منزل ما

Birayê te

Kera wî

Destmala wê

Gotinên wî

Xanîyê me

Gotinên we

Destê min

Zimanê wan

Pirsa te

Welatê min

Welatê wê

Welatê wan

Debistana min

Debistana wê

Nanên şivanan

Nanên şivanî (şivîn / şivên

Nanê şivanî (şivîn

Sêva keçikê

Sêvên keçikê

Sêvên keçikan

## و - حالت حرف ندا (کج کردن اسم بعد از حرف ندا) bêjeyên bangî

موقعیکه اسامی در وضعیت ندا کردن (حالت صدا کردن bangîkirin) باشند، کج می شوند. معمولاً این حالت صدا کردن اغلب اوقات برای:

۱- گلایه کردن ۲- درد و رنج ۳- شادمانی و خوشی

بکار می روند و حالت شگفتی، تعجب، حیرت، حسرت و عجیب بودن را بیان می دارد. اسامی که مونث و مفرد باشند با گرفتن پسوند ê - ، اسامی مذکر و مفرد با گرفتن پسوند o - ، اسامی جمع از هر دو جنسیت (چه مذکر و چه مونث) با پسوند no - (بعد از حروف صدادار) و یا ino - (بعد از حروف صامت) کنایه یا کج می شوند .

1 - حروف ندا برای گلایه کردن (Bangên gzaîkirinê) شامل :

Lo, Lolo, wey lo, Lê, Lêlê, wey lê, Hey, hey lo, hey lê, hey hey, hey gidî (hey gicî), gicî gicî

2 - حروف ندا برای دلخوشی و شادمانی (Bangên dilxweşî û şadîyê) شامل:

êh, hah, hih, ox, xweş, de

3 - حروف ندا برای درد و نفرین (Bangên êş û nifir) شامل:

